

T.C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Ayetullah ÇELİK

KÜRT DESTANLARINDA İMTİHAN MOTİFİ

YÜKSEK LİSANS TEZİ

MUŞ-2023

T.C.
MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ
SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ
KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI

Ayetullah ÇELİK

KÜRT DESTANLARINDA İMTİHAN MOTİFİ

YÜKSEK LİSANS TEZİ

TEZ DANIŞMANI
Doç. Dr. Mehmet Emin PURÇAK

MUŞ-2023

K.T.
ZANÎNGEHA MÛŞ ALPARSLAN
ENSTÎTUYA ZANISTÊN CIVAKÎ
ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ

Ayetullah ÇELİK

DI DESTANÊN KURDÎ DE MOTÎFA ÎMTIHANÊ

TEZA MASTIRÊ

RÊVEBIRÊ TEZÊ

Dr. Öğr. Üyesi Mehmet Emin PURÇAK

MÛŞ-2023

NAVEROK

NAVEROK.....	I
ÖZET.....	II
ABSTRACT.....	III
KURTE	IV
KURTEBÊJE	V
PÊŞGOTIN.....	VI
DESTPÊK.....	1

BEŞA YEKEM

DESTAN

1.1. DESTAN ÇI YE	6
1.2. CUREYÊN DESTANAN.....	9
1.2.1. Destanên Xwezayî.....	9
1.2.2. Destanên Çêkirî.....	9
1.3. TÊKILIYA DESTANAN BI CUREYÊN VEGOTINÊ YÊN DÎN RE.....	10
1.3.1. Destan û Çîrok.....	10
1.3.2. Destan û Efsane.....	11
1.3.3. Destan û Mît.....	11
1.4.XEBATÊN LI SER DESTANÊN KURDÎ HATINE AMADEKIRIN.....	12
1.4.1. Tezên Di Derbarê Destanên Kurdî De.....	12
1.4.2. Pirtûkên di Derbarê Destanên Kurdî de.....	13
1.4.3. Gotarên Di Derbarê Destanên Kurdî De	15
1.5. RÊ û RÊBAZÊN LÊKOLÎNÊN LI SER DESTANAN.....	16
1.5.1. Rêbaza Li Gor Epîzotan.....	17
1.5.2. Rêbaza Li Gor Motîfan.....	19

BEŞA DUYEM

MOTÎF-INDEX of FOLK-LITERATURE

2.1. MOTÎF.....	20
2.2. MOTÎFA ÎMTIHANÊ.....	23
2.2.1. Di Motif Indexê De Mînakên Motîfên Îmtihanê.....	24

BEŞA SÊYEM

DI DESTANÊN KURDÎ DE MOTÎFA ÎMTIHANÊ

3.1 GUHERTOYÊN DESTANÊN DI VÊ XEBATÊ DE CIH GIRTINE.....	28
3.1.1. Destana Memê Alan.....	28
3.1.2. Destana Siyabend û Xecê.....	29
3.1.3. Destana Derwêşê Evdî.....	30
3.1.4. Destana Kerr û Kulik.....	32
3.1.5. Destana Binefşa Narîn.....	32
3.1.6. Destana Sêva Heciya.....	33
3.1.7. Destana Zembîlfroş.....	34
3.1.8. Destana Kela Dimdimê.....	35
3.2. DÎ DESTANÊN KURDÎ DE MÎNAKÊN MOTÎFÊN ÎMTIHANÊ.....	36
3.2.1 H0. – H199. Îmtihanên Nasnameyê: Naskirin.....	36
3.2.1.1. H11. Naskirin Bi Vegotina Çîroka Jiyanê	36
3.2.1.2. H24. Ji Xewnê Naskirin	37
3.2.1.3. H50. Bi Rêya Nîşaneyên Laşî an Tevergerên Fîzîkî Naskirin	38
3.2.1.4. H79. Bi Rêya Deng Naskirin	38
3.2.1.5. H81. Naskirin Bi Rêya Tiştên Di Xewnê De Ji Leheng Stendî	38
3.2.1.6. H82. Naskirina Bi Rêya Nîşaneyên Zewacê	39
3.2.1.7. H86. Naskirina Bi Rêya Gustîla Nav Li Serê Nivîsî.....	39
3.2.1.8. H172. Ajal Tenê Xizmeta Yekî Dike	39
3.2.2. H200. – H299. Îmtihanên Rastiyê.....	40
3.2.2.1 H217. Zava Dû Şerê Yek Bi Yek Wê Diyar Bibe.....	40
3.2.3. H300. – H499. Îmtihanên Zewacê.....	40
3.2.3.1. H310. Îmtihanên Xwezgîniyê	40
3.2.3.2. H314. Îmtihankirina Jidiliya Xwezgînî.....	41
3.2.3.3. H326. Îmtihana Xwezgînî Bi Rêya Hunera Nêçîrê.....	41
3.2.3.4. H331. Îmtihana Gulaşa Xwezgînî, Bi Bûkê Re	42
3.2.3.5. H331. Îmtihana Xwezgînî: Serkeftina Di Şer De.....	42
3.2.3.7. H.335. Erka Xwezgînî: Têkbirina Rakîbê Xwezgînî	42
3.2.3.8. H.362. Bûk Ji Nav Keçikên Di Cejnê De Tê Bijartin	43
3.2.4. H.500. – H899. Îmtihanên Jîrekiyê.....	43

3.2.4.1. H509. Îmtihana Kêrhatîbûnê	43
3.2.5. H900. – H1199 Îmtihanên Qabîliyetê	44
3.2.5.1. H910. Dana Erkan Wek Bersivek Ji Bo Pêşniyar	44
3.2.5.2. H919. Bi Pêşniyara Qewraşê Xayîn Erkên Ku Têne Dayîn	44
3.2.5.3. H945. Erkên Xwebexşî Têne Hildan	45
3.2.5.4. H971. Erkên Bi Alîkariya Pîrek Têne Cih	45
3.2.5.5. H976. Erk Ji Aliyê Lehengê Efsûnî Têne Cih.....	46
3.2.5.6. H981. Erk Ji Aliyê Birayan De Têne Cih	46
3.2.5.7. H982. Erka Bi Alîkariya Ajalan Tê Cih.....	47
3.2.5.8. H1020. Karên Li Dijî Zagonên Xwezayê	47
3.2.5.9. H.1023. Erkên Li Dijî Xwezaya Tiştan.....	48
3.2.5.10. H1024. Erkên Li Dijî Xwezaya Ajalan	48
3.2.5.11. H1090. Erkên Ku Bi Lezeke Derasayî Têne Cih	48
3.2.5.12. H1155. Kedîkirina Ajalên Hov	49
3.2.5.13. H1161. Kuştina Ajalên Hov	49
3.2.5.14. H.1210. Erka Ji Aliyê Qrêl De Tê Dayîn.....	49
3.2.5.15. H1215. Erka Piştî Ku Leheng Pesnê Xwe Dide Tê Dayîn.....	50
3.2.5.16. H1217. Piştî Dîtina Xewnê Erka Tê Dayîn	50
3.2.5.17. H1217.1. Gera Li Dû Şîroveya Xewnê	50
3.2.5.18. H1220. Erkên Xwebexşî Têne Hildan	51
3.2.5.19. H1233. Alîkar Di Pêkanîna Erkê De.....	51
3.2.5.20. H1233.1. Jîna Pîr.....	52
3.2.5.21. H1233.2. Mêrê Pîr.....	52
3.2.5.22. H1233.3. Mêrê Pîroz.....	53
3.2.5.23. H1233.6. Wek Alîkar Hesp	53
3.2.5.24. H1236. Derbaskirina Rêya Xeternak Di Dema Erkê De.....	54
3.2.5.25. H1301. Gera Li Dû Keybanûya Li Dûr.....	54
3.2.5.26. H1308. Gera Li Dû Hespê Herî Rind.....	54
3.2.5.27. H1381. Gera Li Dû Keçîka Di Xewna Xwe De Dîtî.....	54
3.2.5.28. H1397. Gera Li Dû Neyaran	55
3.2.6. H1400. – H1599. Îmtihanên Dinê.....	55
3.2.6.1. H1450. Îmtihana Baldariyê	55

3.2.6.2. H1500. Îmtihana Berxwedanê.....	55
3.2.6.3. H1553. Îmtihana Sebrê.....	56
3.2.6.4. H1558. Îmtihana Hevaltiyê	56
ENCAM.....	57
ÇAVKANÎ.....	63



ÖZET
YÜKSEK LİSANS TEZİ
KÜRT DESTANLARINDA İMTİHAN MOTİFİ

Ayetullah ÇELİK

Tez Danışmanı: Dr. Öğr. Üyesi Mehmet Emin PURÇAK

2023, 80 sayfa

Bu çalışmada konu, Kürt destanlarında yer alan imtihan motifi örnekleridir. Motif Index'in Kürt destanları üzerinde uygulanabilirliği var mıdır, yani bir başka deyişle Kürt destanlarından derlenen imtihan motifi örnekleri bu yöntemle göre midir, değil midir? Çalışma bu sorular ile başlanmış ve bu sorulara verilen cevaplar ile sonlandırılmıştır. Stith Thomson'ın Motif-Index of Folk-Literature eserinde yer alan motif örnekleri içerisinde Kürt folklor ürünlerinden herhangi bir örneğin bulunmaması bizleri böyle bir çalışmaya iten asıl etken olmuştur. Bütün milletler gibi Kürt milletinin hafızasında da bazı destan örnekleri varlıklarını koruyarak günümüze kadar ulaşmışlardır. Birçok araştırmacı tarafından Kürtçenin konuşulduğu bölgelerden derlenen destan örnekleri olsa da bu örnekler üzerinde çok fazla teorik çalışma yapılmadığını görmekteyiz. Ancak son yıllarda Kürt dili ve edebiyatının tüm dallarında olduğu gibi destanlar üzerinde de akademik çalışmaların arttığına şahitlik etmekteyiz. Bu çalışma, alandaki bir boşluğu doldurmayı amaçlamaktadır.

Çalışmanın birinci bölümünde destan kavramı, destan türleri, destanların diğer anlatı türleri ile ilişkisi ve Kürt destanları üzerine yapılan çalışmalar üzerinde durulmuştur. İkinci bölümde Motif-Index of Folk-Literature (Halk Edebiyatının Motif İndeksi) adlı eserde yer alan motif kavramı ve eserde yer alan imtihan motifi örnekleri üzerinde durulmuştur. Bu eserin içeriğinde çeşitli folklorik anlatılarda yer alan motif örnekleri yer almaktadır. Çalışmanın üçüncü ve son bölümünde araştırmanın kapsamında yer alan destanların özetlerine ve bu destanlarda tespit edilen imtihan motifleri örneklerine yer verilmiştir.

Anahtar Kelimeler: Destan, Kürt Destanları, Motif, Folklor, Motif-Index of Folk-Literature.

ABSTRACT
MASTER’S THESIS
TRIAL MOTIF IN KURDISH EPIC

Ayetullah ÇELİK

Advisor: Assoc. Prof. Mehmet Emin PURÇAK

2023, Page: 80

In this study, the subject is the examples of test motifs in the Kurdish epics. Is the Motif Index applicable to Kurdish epics, in other words, are the examples of test motifs compiled from Kurdish epics according to this method or not? The study started with these questions and ended with the answers given to these questions. The fact that there are no examples of Kurdish folklore products among the motif samples in Stith Thomson’s Motif-Index of Folk-Literature has been the main factor that prompted us to such a study. Like all nations, some epic examples have survived in the memory of the Kurdish nation, preserving their existence. Although there are examples of epics compiled from regions where Kurdish is spoken by many researchers, we see that not much theoretical work has been done on these examples. However, in recent years, we have witnessed an increase in academic studies on epics as well as in all branches of Kurdish language and literature. This study aims to fill a gap in the field.

In the first part of the study, the concept of epic, epic types, the relationship of epics with other narrative types and studies on Kurdish epics are emphasized. In the second part, the concept of motif in the work called Motif-Index of Folk-Literature and the examples of examination motifs in the work are emphasized. In the content of this work, there are examples of motifs in various folkloric narratives. In the third and last part of the study, the summaries of the epics within the scope of the research and the examples of test motifs determined in these epics are given.

Key Words: Epic, Kurdish Epics, Motif, Folklore, Motif Index of Folk-Literature.

KURTE
TEZA MASTIRÊ
DI DESTANÊN KURDÎ DE MOTÎFA ÎMTIHANÊ
ÇELİK, Ayetullah
Şêwirmend: Doç. Dr. Üyesi Mehmet Emin PURÇAK
2023, 80 Rûpel

Di vê xebatê de mijar di destanên Kurdî de mînakên motîfên îmtihanê ne. Motîf-Index li ser destanên Kurdî jî xwedî karîgeriyekê ye an na, bi gotineke din li gor vê rêbazê jî nav destanên Kurdî jî mînakên motîfên îmtihanê tên berhev kirin an na? Ev xebat ji bo dîtina bersiva van pirsan hatiye dest pê kirin û bi bersiv dana van pirsan hatiye encam dan. Weke tevahiya netewan, di bîra netewa kurd de jî hinek mînakên destanan hebûna xwe parastine û xwe gihandine roja îroyîn. Bi rêya berhevkarîyê ji qadên ku lê zimanê Kurdî tê axaftinê mînakên destanan hatibin berhev kirin jî li ser van mînakên, xebatên teorîk zêde nehatine kirin. Lê di van salên dawîyê de xebatên akademîk yê li ser destanan û herwiha li ser tevahiya şaxên ziman û edebiyata Kurdî zêde dibin. Ev xebat, di vê qadê de dagirtina cihek vala ji xwe re dike mebest.

Di beşa ewil ya vê xebatê de li ser têgeha destanê, cureyên destanan, têkiliya destanan bi cureyên vegotinê yê din re û xebatên li ser destanên Kurdî hatine kirin hatiye sekinandin. Di beşa duyem de jî li ser têgeha motîfê û mînakên motîfên îmtihanê yê di berhema Motif-Index of Folk-Literature (Îndexsa Motîfên Edebiyata Gel) de cih girtine hatiye sekinandin. Ev berhem di naveroka xwe de mînakên motîfên ku di cureyên vegotinê folklorîk de cih girtine diheve. Di beşa sêyem û ya dawîya vê xebatê de kurteyên destanan û mînakên motîfên di van destanan de hatine tesbit kirin cih girtine.

Peyvên Sereke: Destan, Destanên Kurdî, Motîf, Folklor, Motif Index of Folk-Literature.

KURTEBÊJE

hwd.	:	Her wekî din
wd.	:	Wekî din
r.	:	Rûpel
z.	:	Zayîn
m.	:	Mirin
MIFL	:	Motif-Index of Folk-Literature
DMA	:	Destana Memê Alan
DSX	:	Destana Siyabend û Xecê
DSH	:	Destana Sêva Heciya
DKK	:	Destana Kerr û Kulik
DZ	:	Destana Zembîlfiroş
DDE	:	Destana Derwêşê Evdî
DBN	:	Destana Binefşa Narîn
DKD	:	Kela Dimdimê

PÊŞGOTIN

Li ser rûyê erdê netew, hebûna xwe li ser hinek hîman ava kirine. Ev hîm, sînorên di navbera netewan de diyar dikin. Li Fransayê dema ku serhildêr serî hildan û çiraya fikra netewetiyê pêxistin haya wan ji encamên wê tevgera wan tunebû. Agirê wê çirayê roj bi roj geştir bû û bêyî ku ew agir vemire war bi war geriya û bandora xwe gihand heta roja îroyîn. Fikra netewetiyê jî ji wê serhildanê za û li nav welatan belav bû. Di bin desthilatdariyên kom neteweyî de pêvajoya ji hev qetandin û cudabûna netewan dest pê kir. Piştî vê demajoyê netew ketin pey şopa rehên xwe yên resen. Gera li dû van rehên resen, qîmeteke zêde zêde bar kir li ser xebatên çandî. Folklor wek şaxek ji van xebatan zîl da û qad û sînorên xebata xwe roj bi roj berfirehtir kir.

Di binbeşa zanista folklorê de jî destan, di mijara danasîna tevgerên netewan de roleke girîng dilîze. Li gor motîfên di naveroka xwe de di hewînî destan, dîsa ji aliyê hinek lêkolîneran de bûye mijara xebatê. Lêkolîna li gor motîfan ji wan xebatan yek e. Lêkolînerê Emerîkî Stith Thompson li dû xwe bi navê *Motif-Index of Folk-Literature* berhemê ewqas berfireh hiştiye ku ev berhem ji bo xebatên di vê qadê de wek çavkaniyeke bingeîn tê pejirandin. Ji bo vê xebata li ber destê we jî ev berhem wek çavkaniya xebatê ya sereke cih digire. Ji vê xebatê armanc, di hinek destanên berbelav yên bîra kurdan de ravekirin û raxistina pêş çavan ya mijara motîfa îmtihanê ye. Guhertoyên destanên ku di vê xebatê de cih girtine ji nav guhertoyên nivîskî hatine bijartin.

Mijara xebata min imtihan e. Dema min ji bo xebatê ev mijar bijart min nizanibû li pêş min jî ewqas îmtihan hene. Ji Covîd-19yê bigire, heta erdhejê. Ev bûyer di vê demajoyê de qewimîn û rasterast bandorê li ser vê xebatê kirin. Di demajoya lêkolîna vê xebatê de ev jî îmtihanên li pêş min bûn. Lê weke di destanan de derdikeve pêş me di vir de jî li dor lehengê ku bi îmtihanên re rûbirû dimîne hinek alîkar peyda dibin û bo leheng bi awayekî serkeftî ji îmtihanên derbas bibin ji wan re dibin alîkar. Bi xêra serê wan alîkaran e ku leheng ji van îmtihanên derbas dibin. Ez ê niha di vir de behsa van alîkaran bikim. Mamoste Mehmet Emîn Purçak ji xwendina min ya lîsansê bigire heya dawîya xwendina lîsansa bilind şêwirmendiya min kir. Di vê demajoyê de ez rastî hinek astengiyan hatim. Lê şêwirmendê min dest da min û ji bo ji holê rakirina van astengan alîkariya min kir. Ev xebat herî zêde bi alîkarî û şêwirmendiya wî gihişt vê derê. Bo

tevahiya alîkariyên wî malavayiya cenabê wî dikim. Rexne û pêşniyarên endamên lîjneya teza min jî ji bo bi awayekî têkûztir xilasbûna vê xebatê pir bi qîmet bûn ji bo min. Ji bo şîrove, rexne û pêşniyarên wan, malavayiya mamoste Îlyas Suvağci û mamoste Fırat Taş dikim. Ji bo dawî lê hatina vê xebatê min, moral û enerjîyeke çê ji mamoste Semih Gezer girt. Bila her tişt bi dilê wî be. Agahî û pêşniyarên mamoste Ümit Işık ku di dersên xwe de bi min re parve kirine di vê demajoyê de rêya min ronî kirin. Ji bo tevahiya alîkariyên wî malavayiya wî dikim. Ezbenî ji bo mirov li ser maseyê rûnî û ji nav rûpelên pirtûkan van agahiyan hilde hewcehî bi xebatên qadê hene. Bêyî vana jî xwe ne pêkan e ev xebat bêne kirin. Ji vê bonê ji berê heya niha ez malavayiya tevahiya kedkarên zimên yên di qadê de karê berhevkarîyê kirine dikim. Ev xebat li ser van ked û xwêdanên eniya we hatiye amade kirin. Para herî mezin di vê xebatê de ya we ye. Malbata min, nemaze jî dayika min di vê demajoyê de û di tevahiya demajoya xwendina min de alîkariya min kirin û bi hebûna xwe hêzê dan min. Bila her tişt bi dile wan be. Wek gotina dawiyê, ji destpêka xwendina min heya niha malavayiya tevahiya wan kesan dikim ku çi biçûk çi mezin di xwendina min de tevlibûneke wan çêbûye.

DESTPÊK

1. Armanc û Çarçoveya Lêkolînê

Motîvasyona bijartina vê mijarê û xebata li ser vê mijarê ji du cihan tê. Bi gotineke din, ev xebat ji du aliyên de lêkolînerê vê xebatê ji bo xebata li ser vê mijarê motîve kiriye. Ev di heman demê de wek armancên sereke yê vê lêkolîne tînin hesibandin. Li ser şaxên edebiyata Kurdî xebat pir kêr in. Di salên dawiyê de di vê qadê de her çiqas pêşveçûnek li pêş çavan hebe jî hê di gelek şaxan de li ser gelek mijaran xebat nehatine kirin. Ji vana yek jî xebatên li ser folklorê Kurdî ne. Folklor jî dema em dibêjin em behsa zanistê berfireh ku ji gelek şaxan pêk hatiye dikin. Destan yek ji beşên herî girîng yê zanistê tînin qebûl kirin. Di vê qadê de ji hinek aliyên de, li ser hinek taybetiyên destanan xebat hatine kirin. Ev xebat jî herî zêde ji bo piştgiriya bo qada Kurdolojiyê hatiye amade kirin. Dagirtina cihê vala yê di qada Kurdolojiyê de çavkaniya motîvasyona bîgehî ya vê xebatê ye. Armanca duyemîn ji vê xebatê kişandina bala lêkolîneran ya li ser Motîf-Index of Folk-Literatureyê ye. Lewra li gor zanîna me lêkolînerên ku bala wan li ser folklorê Kurdî ne ji vê rêbazê baş sûd wernegirtine. Di MIFLê de 23 cureyên motîfan hene. Di vê xebatê de tenê motîfa îmtihanê cih girtiye. Li ser 22 motîfên dinê xebatek berbiçav nehatiye kirin. Ji vê xebatê hêvî hatiye kirin ku ev valahiya di vê qadê de bala lêkolîneran bikişîne ser xwe û ev valahî bi xebatên akademîk bêne dagirtin.

Li ser motîfên ku di berhemên folklorîk de peyda dibin de gelek xebat hatine kirin. Lê ev xebat li ser rêbaza şematîze kirina motîfan ya Stith Thomson hatiye avakirin. Li gor vê rêbazê jî di berhemên folklorîk bi 23 cureyan motîf cih digirin. Çarçoveya vê xebatê weke ji navê xebatê jî diyar e, di MIFLê de tenê bi motîfa îmtihanê hatiye sînordar kirin. Guhertoyên destanên di vê xebatê de cih girtine jî ji berhemên çapkirî hatine bijartin. Lê ji aliyê mekanê de di bijartina mînakên destanan de sînorek nehatiye danîn. Weke tevahîya şaxên zanistê civakî di demajoya berhevkirina kereste û agahiyên pêwîst de li pêş min wek çavkanîyên devkî û nivîskî du cure çavkanî hebûn. Lê ji ber ku ji çavkanîyên devkî guhertoyêke bi rêk û pêk bi ber destê min neket min jî berê xwe da çavkanîyên nivîskî.

2. Di Lêkolînê de Rê û Rêbaz

Destan ji aliyê naverok û şiklê de bi hinek cureyên vegotinên folklorîk re tê tevlihev kirin. Wek mînak di navbera destan û çîrokan de û di navbera destan û efsaneyan de cudahiyên pir biçûk hene. Ji bo ji holê rakirina van tevliheviyan di destpêka xebatê de hewcehi bi ravekirin û diyar kirina cudahiyên di nav van cureyên folklorîk de hebû. Dû vê ji ber tunebûna bîbliyografeke têkûz ya di derbarê xebatên li ser destanan de me di serenavek de cih da xebatên ku li ser destanan hatine amade kirin. Beşa yekem bi tevahî ji bo rave kirina têgeha destanê, cureyên destanan, xebatên li ser destanên Kurdî hatine kirin re hatiye terxan kirin.

Di beşa duyem ya vê xebatê de danasîna peyva motîfê cih digire. Di MIFLê de motîf çawa cih digire û ji vê xebatê mînakên motîfên îmtihanê li vê xebatê hatine zêde kirin. Wergera MIFLê li ser zimanê Kurdî û Tirkî nehatiye zêde kirin. Ev berhem ji aliyê kesên li ser vê rêbazê xebitîne de tenê hinek beş hatine wergerandin. Ji vê bonê me di serî de berê xwe da van wergeran. Di vir de me ji xebata Prof. Dr. Ali Berat Alptekîn ya bi navê *Halk Hikâyelerinin Motif Yapısı* zêde zêde sûd wergirt. Li ber vê berhemê teza doktorayê ya Prof. Dr. Esmâ Şimşekê ya bi navê *Yukarıçukurova Masallarında Motif ve Tip Araştırması* û xebata Prof. Dr. Ensar Aslan ya bi navê *Halk Hikâyelerinin İnceleme Yöntemleri, Yaralı Mahmut Hikâyesi Üzerinde Bir İnceleme* bûn berhemên alîkar di vê xebatê de. Lê ev xebat ji ber ku tenê li ser hinek beşên MIFLê rawestiyabûn hewcehiya me bi berhema esli çêbû. Li dû gerîneke dirêj jî me xwe gihand berhema eslî. Di pirtûkxaneyê onlayn ya Zanîngeha Alberta (*University of Alberta*)yê de çapa vê berhemê heye û ji tevahiya lêkolîneran re deriyên wê vekirî ne. Du ku me xwe gihand berhema eslî, me xebata xwe li ser vê berhemê saz kir.

Di beşa sêyem ya vê xebatê de jî kurtayên destanan û mînakên motîfên îmtihanê yên di van destanan de hatine tesbît kirin cih girtine. Ji ber ku di navbera çîrokên gel û destanan de ji aliyê dirûvî û naverokî de cudahiyên pir biçûk hene, di demajoya bijartina mînakên destanan de zehmetiyek derket pêşiya me. Hinek berhemên ku em wan wek destan bi nav dikin di hinek xebatan de wek çîrokên gel derbas dibin, berevajîya vê hinek berhemên ku wek çîrokên gel derbas dibin jî di hinek berheman de wek destan hatine bi nav kirin. Di vir de gengeşiya derketî bi pênaseyên hinek lêkolîneran yên di derbarê destanê de kirine ji holê rabû. Li gor folklorîst Necat Keskîn (2019: 188), ji bîra kurdan tenê Kela Dimdimê taybetiyên destanan di xwe de dihevin. Li gor

pênaseya Keskîn, ji derveyî Kela Dimdimê qiseyên ku me li vir wek destan bi nav kirine *“hikayeyên gelêrî”* ne. Belê ji bo em karibin ji vebêjeyekê re destan bêjin hinek hewcehî divên. Ew hewcehî di pênaseya têgeha destanê de ji xwe diyar in. Kaplan (2019:12), di derheqa destanan de *“di destanan de bûyerên dîrokî û civakî yên karîgeriyeke mezin li ser civakê hiştî bi awayekî menzûm têne vegotin”* gotiye. Mînakên vebêjeyên ku me di vê xebatê de wek destan bi nav kirine hinek van taybetiyên têgeha destanê di naverokên xwe de di hewînîna lê hinekan nahewînîna. Li gor hinek lêkolîneran destan bes ne ji cureyekê lê ji gelek cureyan pêk tên. Çobanoğlu (2020: 58-89), di derbarê destanê de van tiştan dibêje û ji aliyê mijarên ku di hundirînîna de destanan vediqetîne van cureyan:

Di destanan de ji aliyê mijarê de sînorkirinek nîne. Her mijar dikare têkeve çarçoveya destanê. Destan ji aliyê naverokên xwe de wuha têne senifandin: 1.Destanên derbarê jiyanî civakî de, 2.Destanên derbarê jiyanî çandî de, 3.Destanên derbarê jiyanî aborîyê de, 4.Destanên derbarê jiyanî perwerdehiyê de, 5.Destanên derbarê jiyanî siyasî de 6.Destanên derbarê jiyanî olî û sincê de 7.Destanên derbarê jiyanî leşkerîyê de, 8. Destanên derbarê civakî-çandî de, 9.Destanên derbarê jiyanî xwezayî de, 10.Destanên derbarê mirovan de.

Di vê xebatê de me vê pênaseya Çobanoğlu jî ji xwe re esas girt û li gor vê penase û ravekirinê me van metnan wek destan ji bo xebata xwe bijartin. Di derbarê êwîrên qewimîna destanan de Oğuz (2004: 7), behsa pênc êwîran dike: *Êwîra destanê, kevneşopiya devkî, bûyer, hozan û kifşkirin*. Yanê bi gotineke dinê, hebûna êwîra qewimîna bûyerê, hebûna kevneşopiya çanda devkî, hebûna bûyereke di bîra gel de mayî, ji aliyê hozanek de vegotina vê bûyerê û di dawiyê de kifşkirina vê bûyerê. Di vebêjeyên ku me ji bo vê xebatê di bin sernavê mînakên destanan de cih daye wan de pîraniya van êwîran pêk hatine. Ji vana ya herî girîng bûyerên ji bo van vebêjeyan bûne mijar di bîra hevpar ya gel de cihek dagir kirine. Ji bo xebata xwe me, ji bîra kurdan bûyerên herî berbelav yên ku hinek taybetiyên destanan di naverokên xwe de di hewînîna û li gor gelek krîterên cureya destanê, wek destan dikare bîne dîtîna bijartine.

3. Astengiyên Li Pêş Xebatê

Di demajoya bijartina van destanan de ez rastî hinek astengiyan hatim. Li gor pênase û taybetiyên destanê ku me li jorê behs kirine min ê kîjan bûyer û qiseyê wek destan tevî nav çarçoveya xebata xwe bikira? Pirsê duyem piştî ku me vê pirsê bersivand dor hat ser pirsê me ya bijartina guhertoyên destanan. Me yê kîjan guhertoyê, li gor kîjan krîteran ji bo xebata xwe, ji yên dinê bineqanda. Ev pirsên heyî ku di destpêka xebatê de di serê me da zîl dabûn, dû ku me xwe gihand çavkaniyên di vê qadê de cihê xwe ji bersivên tije re hiştin û yeko yeko ji holê rabûn.

Di vir de, li ser navê xebatê dibe ku pirseke wek, “*çima gelo azmûn na lê îmtihan?*” bê pirsîn. Ez dikarim wek bersiv wuha bêjim. Lêkolînerên ku bi zimanê Kurdî xebatan dikin rastî hinek astengiyan tên. Li pêş lêkolînerên ku xebatên xwe bi zimanê Kurdî dikin, ferhengeke standard ya ku tevahiya peyvên zimên di hundirê hema hema nîne. Ji ber ku zimanê Kurdî ji gelek zaravayan pêk tê û dîsa ji ber ku di nav van zaravayan de têkiliyek xurt nîne di standardîze kirina zimên de hinek astengî derdikevin pêş. Li ser standardîze kirina zimên hinek bizav derketine pêş. Ji vana yek ya Haugen e. Li gor bizava Haugen di navbera veguhezîna zaraveyek bo zimanek de û pêşketina nivîsê û mezinbûna netewperestiyê de têkiliyeke nêzik heye. Ji bo guherîna di vî aliyê civakî-zimanî de 4 şert divên:

1. Bijartina normê: Yanê ji nav zaravayên zimên bijartina yekê. **2. Kodkirina awayê:** Yanê di kodkirina norma hatiye bijartin de di hêla telafûz û nivîsê de rakirina guhertinên biçûk di nav hemûyê peyv û wateyan de. **3. Pêşxistina erkê:** Awayê hatiye kodkirin di bikaranînê de pêdiviyê bi guherînên pir biçûk dibîne, yanê di zanist, edebiyat, rojnamegerî û hwd. de. **4. Pejirandina civakê:** Yanê awayê hatiye kodkirin divê ji aliyê girseyên bikarhêner de bê pejirandin. (Hassanpour, 2005: 93).

Lê ji bo pêkhatina vê bizavê hewcehî bi otorîteyê dewletî heye. Kurd jî ji vê otorîteyê bêpar in. Niqaşên di vê mijarê de, li ser çawaniya zimên serdemek berê hatine destpê kirin. Ji bo ji holê rakirina van pirsgerêkan Xelîl Xeyalî di kovara Jînê de (Alan, 2013: 46-47), behsa avakirina saziyekê dike. Dibêje ev sazî divê *ne tenê ferhengeke hevgerî ya ji hemû zaravayên kurdî pêkhatî amade bike, di heman demê de ev sazî, çi exlaqî, çi xeyrî-exlaqî, lazim e hemû gotinên pêşiyar, çîrok û efsaneyan jî berhev bike. Saziya ku Xeyalî serdemeke berê behskirî hê jî nehatiya ava kirin. Lê di van salên*

dawiyê de di pêşengiya Weqfa Mezopotamyayê de hinek xebat hatine kirin. Ev xebat, ji bo berdewamiya xebatên bi vî awayî û herwiha ji bo ji holê rakirina van astengan hêviyekê li cem me çêdike. Heya asta ku ziman di qada nivîsê de baş bikemile ev astengî wê li pêş tevahiya lêkolînerên vê qadê de bin. Ji ber van sedeman di bijartina peyvan de tevliheviyek derdikeve holê. Ev tevlihevî li pêş vê xebatê jî hebûn. Di vê xebatê de di dewsa *testa Îngilîzî* de min peyva *îmtihanê* bijartîye. Ji ber ku *îmtihan* peyveke di devê gel de rûniştiye di dewsa *azmûnê* de hatiye bijartin.

Em ê wek asteng di vir de behsa çavkaniya eslî ya vê xebatê jî bikin. *Motif Index of Folk Literature* li ser zimanê Kurdî nehatiye wergerandin. Ji vê bonê hewcehiya me bi demeke dirêj hebû da ku em beşên ku ji bo vê xebetê pêwîst in wergerînin ser zimanê Kurdî û hê li serê bixebitin.

BEŞA YEKEM

DESTAN

1.1. DESTAN ÇI YE

Netew, tevahiya nîrxên xwe yê madî û manewî çî bi rêya devkî çî jî bi rêya nivîskî derbasî nîfşên dû xwe dikin û bi vî awayî hebûna xwe diparêzin. Di vê demajoyê de netew, ji bo derbaskirina van nîrxan, rê û rêbazên cûrbecur bi kar anîne. Ev rê û rêbaz piştî ku folklor wek zanistek tê naskirin û wek zanistek xweser sînorên wê yê xebatê tî diyarîkirin di binbeşa cureyên berhemên folklorê de wek têgeh tî binavkirin. Destan di nav van berhemên de cihêkî taybet û girîng digire.

Di zanistên civakî de têgehên heyî xwedî çend wateyan in. Ji bo peyva destanê jî gelek kesan hewl dane da ku di çarçoveya taybetiyên wê de vê têgehê pênasê bikin. Li gor ferhenga Nîşanyan peyva destanê jî *dastan* an jî *dasitanê* hatiye girtin ku ew jî tê wateya “*vebêjî, çîrok, mît*”. Dastan di ferhenga Dexodayê de wek *çîrok, neql, qise, çîrokên pêşyan* derbas dibe. Di zimanên Latînî de jî di heman cihê peyva destanê de *epopoeia* derbas dibe ku ev jî peyveke Grekî ye. Di zimanê Îngilîzî de *epic*, zimanê Frensî de *epope*, zimanê Elmanî de jî wek *epos* derbas dibe ku ev jî bi tevahî jî *epopoeia* ya Grekî derbasî van zimanan bûye. Folklornasê kurd Celîlê Celîl jî peyva *eposê* bi kar tîne. Di zimanê Yewnanî de *epos* tê wateya *çîrokên pexşan*. Keskin ku bi salan e li ser folklorê Kurdî xebatan dike, destanê wuha bi nav dike: “*Destan cureyek ji gotinên gelêrî ye ku hem motîfên mîtolojîk û hem jî yên efsanewî dihewîne.*” (2019: 177). Li gor vê pênasê Keskin em dikarin bibêjin ku destan, mît û efsaneyên wî gelî di naveroka xwe de dihewînin. Înan (1987: 161) destanê dişibîne “*bajarekî nû ku li ser xirbeyên avahiyên kevî hatiye avakirin*”.

Mîrov li dû xwe hinek berhemên ku xîtabê bîra hevpar ya mirovahiyê dikin hiştine. Ji van berhemên hinek jî wan devkî, hinek jî nivîskî ne. Destan jî van cureyan bes hebe e. Destan, hemûyê hêmanên madî û manewî yê wê civakê di naveroka xwe de dihewînin. Ji vê bonê hûrbûyînan li ser van destanan derfeta nasîna wan çandan dide ber destê lêkolîneran. Li gor Ülken (2022: 159), di vejîna dubare ya netewan de hêza herî mezin ya ku taybetiyên kesayetî li netewan bar dike destan in. Destan ne tenê bi berhemekê ve sînorkirî dimînin. Çî bi rêyên rasterast, çî jî bi rêyên nerasterast dikarin bandorê li ser bîra hevpar ya neteweyekê jî bikin. Di serdema 19an de Elias Lönnrot li

ser beşên destana fîniyan yê di nav gel de belavbûyî xebatekê dike. Dû xebateke li qadê tevahiya beşên vê destanê berhev dike û digihîne hevdu. Li gor William Wilson:

Roja ku Kalavela derkete meydanê, hemî cîhana şareza berê xwe da Fînlandîyaya jibîrbûyî. Kalavela di jiyana me ya neteweyî de xaçerêyeke şikestinê ye, ya rast wek neteweyekê peydabûna me bi peydabûna Destana Kalavela re girêdayî ye. Fînî bi Kalavela fêrî xwe bûne, ji xwe bawer kirine. Di nava gel de hişmendiya neteweyî bi kalavela hişyar bûye. (Hikmet, 2016: 27).

Di axaftina rojane de em gelek caran rastî gotinên bi vî awayî tên: “*Evîna wan bû weke destanek*”, an “*şerê wan şerekî destanî bû*”. Ev gotin du taybetiyên bingehîn yê destanan di naveroka xwe de dihevinin û ji bo wateya têgeha destanê bêyî ku li ser destanan xebateke mirov hebe texmînekê bi mirovan re çêdikin. Weke ku di van gotinan de derbas dibe em, evînek an şerekî ji aliyê mezinbûn û nejbîriya wan de dişibînin destanan.

Destan, aidê kîjan neteweyê bin taybetiyên wê neteweyê di naverokên xwe de dihevinin. Netew li gor çi ji hevdu diqetin, taybetiyên ku netewan dikin netew çi ne kêr zêde ev taybetî wek motif di destanan de cihê xwe digirin. Her netew li gor cihê ku lê dijîn, çi ji taybetiyên av û hewayê wî cihê, çi ji taybetiyên erdnîgariya ku lê dijîn, çi ji mijûliyan xwe yê rojane ku pê debara xwe dikin reng û dirûvek digirin. Destan, berhemên gelêrî ne û aidê bîra hevpar ya wî gelê ne. Lê ji ber ku piraniya wan (Piraniya wan dibêjim lewra yê weke Gilgamêş ku bi rêya nivîsê gihîştine dema me jî hene.) bi rêya devkî gihîştine ber destê me bi awayekî xwezayî di avahiyên wan de hinek guherîn pêk hatine. Ji bo ku ji naverokên van destanan derbarê wî gelê de dîsa bo danasîna wî gelê em karibin hinek tiştan bibêjin, divê em tevahiya guhertoyên van destanan bidin ber hevdu û di dawiya xwendineke danberhevî de hê bigihîjin encamê. Nijadnas û dîroknasê navdar Jack Goody bi salan li ser mîten gelên hov lêkolîn kirine û li dû van xebatên xwe dibêje (Örkün, 2018) ku vegotîneke westar tune ye. Dibêje beriya nivîsê jiberkirin tune ye. Ji vê bonê dema vebêjer bûyereke pêşkêş dikin hinek cihên ku di bîra wan de namînin li gor hêza hunera xwe wê valahiya heyî bi peyv û hevokên xwe dadigirin. Em kesên li ser folklorê dixebitin dema ji qadê keresteyan berhev dikin, bertekên çavkaniyan me jî van nêrînen Goody piştrast dikin. Di hevdîtîneke me ya qadê de pîrêya 90 salî dema çîroka Mîrze Mihemed ji me re vedigot, di navberê de disekin û “*qisûra min nenihêrin, ev der hindik maye di bîra min de*” digot. Pîrê radibû cihê ku ji

çîrokê de di bîra wê de nemayî li gor xwe tije fikir. Li gor Goody, meseleya guhertoyan jî ji vê derê derdikeve.

Destan ji bûyerên dîrokî, civakî û xwezayî dizên. Di destanan de bûyerên asayî û derasayî tevlihev in. Yanê pêkan nîne ku destanek ji serî heya binî li dor bûyerên derasayî hatibe honandin. Di destana Memê Alan (Lescot, 2020) de weke qewimînek derasayî, Mem û Zîn bêtî ku di mekanekî fîzîkî yê hevpar de li cem hevdu bimînin gustîlan ji hevdu digirin. Wek mînak dîsa di heman destanê de bo bal û guhertina bi cihek din de, ji layê Hesên (di guhertoya Mem û Zîna Xanî de Tacdîn) de agir berdana xanî weke bûyereke asayî tê dîtin. Di tevahiya destanan de weke taybetiyeye cureya destanê, bûyerên wuha bi hevdu re cih digirin. Destan bi gelemperî helbestkî ne lê pîraniya wan weke metnên pexşan gihîştine roja îroyîn. Pêkan e ku lehengên destanan xwediyê taybetî û xisletên derasayî bin. Di destana Siyabend û Xecê de Siyabend bi tena serê xwe bi sedan lêşkerên Hesên Axa re dikeve cengê û hêza ji holê rakirina tevan di xwe de dibîne. Bi gelemperî di destanan de egîdî, evînî, mirin û hezkirina welêt cih digirin. Dibe ku ev motîf bi hevdu re di naveroka destanek de jî cih bigirin. Weke ku di destana Derwêşê Evdî de cih digirin.

Ji bo derketina hole ya destanan hewcehî bi hinek merhaleyan heye. Qiseyek ji bo wek destan bê qebûlîkirin divê ji van hersê merhaleyan derbas bibe. Di *Beyt û Destanên Kurdî* (Kaplan, 2019: 12) de di derheqa van merhaleyan de ev gotin derbas dibin:

1. Derketina destanê: Di vê qonaxê de hinek bûyerên dîrokî û civakî diqewimin û ev bûyer di xeyal û şûra netewî ya hevpar de teşe digire. Kesên di van bûyeran de cih girtî di xeyala civakê de cihekî girîng digirin. 2. Belavbûn: Bi dewlemendkirina bûyer û lehengan ve destan belav dibe û nîş bi nîş tê veguhestin. 3. Tomarkirin: Di vê qonaxê de destan ji aliyê hunermendekî an jî pisporekî ve tê nivîsîn û tomarkirin.

Piştî ku ev şert pêk hatin êdî ew bûyer wek destan tê binavkirin. Oğuz (2013: 59-60) ji bo pêkhatina destanan behsa 5 merhaleyan dike. Merhaleya destanê, merhaleya di civakê de hebûna kevneşopîya devkî, merhaleya hebûna bûyerê, merhaleya ji aliyê hozanek de vegotina vê bûyerê û merhaleya pêncem û dawî jî merhaleya kifşkirina metnê ye. Di bîra kurdan de gelek bûyer hene ku di zimanê gel de wek destan derbas dibin. Lê di vê xebatê de metn û bûyer li gor van merhaleyan ji nav yên dinê hatine bijartin.

1.2. CUREYÊN DESTANAN

Destan ji aliyê derketina xwe ya holê de vediqetin du beşan. Destanên xwezayî û destanên çêkirî (Filiz, 2014: 20).

1.2.1. Destanên Xwezayî

Destanên xwezayî serdema derketina wan nayê zanîn û di destanên xwezayî de nivîskarek nîne. Ev cure destan bi rêya devkî belav bûne û xwe gihandine roja me. Ji ber ku bi rêya devkî belav dibin di demajoya belavbûnê de rastî hinek guherînan tên. Ev guherîn piştî demekê li gor herêman guhertoyên nû derdixin holê. Li ser mijara guherînên di berhemên folklorîk de folklornasê tirk Öcal Oğuz dibêje (2013: 76-77), lêkolîner divê di nav van guhertoyan de yekê wek metna eslî û ji yê dinê hêjatir nebîne. Folklornas divê tevahiya pêkenokên Mela Nesredîn yê ku bihîstine, wek metnên esli tomar bike. Öcal vê nêrînê ji bo pêkenokên Mela Nesredîn gotiye lê mirov dikare li ser tevahiya berhemên folklorîk bisepîne. Lewra di tevahiya van berhemên de di demajoya berhevkirin û derbaskirina nivîsa wan de heman krîzên rêbazê derdikevin pêşîya lêkolîneran. Ev berhem piştî ku derbasî nivîsê dibin û bi rêya metna nivîskî belav dibin, guherînên ku li gor dem û erdnîgariyê di van berhemên de pêk tên bidawî dibin. Helbet derbasbûyîna nivîsê ji bo destanan şertek nîne. Derbasbûna nivîsê, di nav astên pêkhatina destanên xwezayî de tenê weke hewcehiyeke demê derdikeve pêş me. Bi bihûrîna demê re ev cure destan jî ji hinek astan derbas dibin û digihîjin roja îroyîn. Di bîra piraniya gelan de ev cure destan hebûna xwe parastine. Di edebiyata cîhanê de ji bo ev cure destananan mînak pir in lê em dikarin Kalavelaya finîyan, Nîbelungena elmananan, Ramayanaya hîntan, Îlîada û Odysseiaya yewnanan û Îgora rûsan ji bo ev cure destanan wek mînak nîşan bidin. Ji bîra giştî ya kurdan jî em dikarin destanên wek Mem û Zînê, Zembîlfiroş û Siyabend û Xecê nîşan bidin.

1.2.2. Destanên Çêkirî

Ev cure destan ji aliyê kesek de piraniya caran li ser berhemeka xwezayî hatiye nivîsîn. Nivîskar di vir de piştî demajoya guherînên di metna eslî de pêk hatine, guhertoyek ji bo metna xwe wek bingeş digre û metna xwe li gor bûyerên wê guhertoyê de dihonîne. Di hinek mînakên ku em dikarin di vê cureyê de nîşan bidin de jî nivîskar, bêyî ku di bin bandora destaneke xwezayî de bimîne metnekê dinivîse. Berevajîya destanên xwezayî, di van destanan de qewimînên derasayî kêr in.

Di edebiyata cihanê de em dikarin *Paradise Lost* (Bihûştê Wenda) ya John Milton (1608-1674), *Jerusalem Delivered* (Qudsa Azadbûyî) ya Torquato Tasso (1544-1595), *Divina Commedia* (Komediyaya Îlahî) ya Dante Alighieri (1265-1321) û *Orlando Furioso* (Orlandoyê Har) ya Ludovico Ariosto (1474-1533) nîşan bidin. Di edebiyata Kurdî de Ehmedê Xanî li gor destana xwezayî ya bi navê Memê Alan berhemeke bi navê Mem û Zîn nivîsiye. Feqiyê Teyran û Miradxanê Bazîdî û Melayê Bateyî destana Zembîlfroşê ji xwe re bingeh girtine û bi vî navê destanek nivîsîne. Ev berhemên destanî, ji hêla cureya folklorîk de wek destan, ji hêla cureya destanê de jî weke destanên çêkirî tên hesibandin.

1.3. TÊKILIYA DESTANAN BI CUREYÊN VEGOTINÊ YÊN DIN RE

Wek berhemên folklorîk destan, ji aliyê şiklî û naverokî de dişibin çîrok, efsane û mîtan.

1.3.1. Destan û Çîrok

Destan weke ku me li jorê jî behs kiriye di naveroka xwe de hêmanên netewî dihewînin. Bervajîya çîrokan di destanan de mijar sînorkirî ne. Dîroka bûyerên ku di destanan de diqewimin diyarkirî ne lê di çîrokan de dîrokek diyarkirî tune ye. Çîrok bi formelan destpê dikin lê di destanan de destpêkirineke bi van formelan nîne. Destan ji bûyerên rastîn derketine holê, herwiha lehengên di destanan de lehengên rastîn in, lê di çîrokan de bûyer û leheng xeyalî ne. Destan ji ber ku berhemên netewî ne bê mînak in yanê di bîra netewan de bi heman naverokê du destan nayên dîtîn. Lê çîrok dibe ku bi heman naverokan di bîra gel û civakên cuda de hebûna xwe biparêzin. Di nav teoriyên folklorê de teoriyeke bi navê teoriya Fînî bi navekî din teoriya dîrokî-erdnîgarî heye. Weke ku Dorson (2017: 35) dibêje, “li gor vê teoriyê çîrokeke ku di nav guhertoyên devkî de hatiye dîtîn ihtimaleke mezin ji derekê, ji çavkaniyekê derketiye û li tevahiya dinê belav bûye.” Li gor vê teoriyê çîrok ji derekê zaye û di nav civakan de belav bûye. Tiştê ku di vê teoriyê de ji bo çîrokan tê gotin ji bo destanan derbas nabe. Destan ji derekê zayine û di bîra civaka wê derê de hebûna xwe parastine. Di vê mijarê de di dewsa gotina dawiyê de em dikarin bibêjin ku di çîrokan de bi devê lehengê baş ji bo guhdarvanan şîret tene dayîn, lê di destanan de armanc şîret nîne.

1.3.2. Destan û Efsane

Di nav hêmanên folklorîk de herî zêde destan û efsane têne tevlihev kirin. Çawa ku me, di beşa çîrok û destanê de jî got, destan hebûna xwe ji bûyerên rastîn digirin. Ji ber vê sedemê destan ji aliyê bûyer, leheng û dîroka xwe de hebûna xwe ji rastiyeke digirin. Lê di efsaneyan de tiştek wuha tune ye. Weke çîrokan, efsane jî vegotinên xeyalî ne. Di destanan de mijarên herî berbiçav lehengî û evîna kesayetî ye lê di efsaneyan de mijar curbicur in. Destan bi gelemperî li ser bûyerên civakî radiwestin lê di efsaneyan de zêdetir bûyerên kesayetî di naverokê de cih digirin. Folklornasê tirk Pertev Naili Boratav (2013: 81) derbarê efsaneyê de wuha dibêje: “Taybetiya bingeîn ya efsaneyê ew e ku mijara wê bawerî ye. Tiştên ku di efsaneyan de derbas dibin rast û weke ku qewimîbin tên hesibandin.” Îro li welêt em li kîjan herêmê bigerin aidê wê herêmê di bîr û baweriya gel de bi dehan efsane hene. Efsaneyên li ser goristanên ewliyayan, efsaneyên li ser ajalan, efsaneyên li ser cin û periyan û hwd.

1.3.3. Destan û Mît

Ji ber ku herdu cure vegotin jî ji demên berê gihîştine dema me û di cih cihan de jî ber hebûna taybetiyên lehengê derasayî yên di destanan de ev herdu cure caran tên tevlihev kirin. Eliade (2001: 15-16), ji bo pênaseya mîtê, “mît çîrokeke pîroz vedibêje, di dema herî kevn de, di dema taybet ya çîrokan de bûyereke ku qewibî be û dawî lê hatibe vedibêje”, dibêje. Vegotina *bûyereke kevn* û peyva *pîrozê* di heman demê de me dibe peyva destanê jî. Di herdu cureyan de jî kevnîbûn û ji bo neteweyan pîroziyek heye. Lê destan, ji mîtan cudatir bûyerên rastîn hildidin naveroka xwe. Di vir de divê em vê bêjin ku hinek mît jî ji rastiyan dîrokî derketine holê. Constantin Brailoiu (Eliade, 2022: 59-60) dema li ser baladên (kilamên bi kafiye û dirêj) gundekî Romanyayê dixebite tiştekî ferq dike. Bûyereke ku di nav gel de wek mîtek ji demên berê tê zanîn di rastiye de çend sal berê qewimiye û di nav gel de belav bûye. Gel êdî rastiye daniye aliyekî û bi mîtê girtiye. Di vir de di naverokên mîtan de zêdetir tiştên xeyalî ku di rastiye de cihek ji bo wan nîne cih digirin. Ferqa mîtê ji destanê ew e ku mît, heke ji buyereke rastîn derketibe holê jî di nezera gel de wek xeyalî têne zanîn. Di destanan de bûyerên rastîn, kesayet û mekanên rastîn hene lê di mîtan de bûyer, mekan û kesayetên ku em wan wek rastî dizanin cih digirin. Di destanan de hêmanên netewî hene lê di mîtan de reng û dirûveke netewî nîne. Di mîtan de mijar bi piranî di derheqa afirandina

cîhanê û amûrên di xizmeta mirovan de ne lê di destanan de mijar bi piranî evîn û lehengî ye. Ji hêla şiklî de destan ji mîtan dirêjtir in. Cudahiyên di navbera destan û mîtan ji vana pêk tên.

1.4. XEBATÊN LI SER DESTANÊN KURDÎ HATINE AMADEKIRIN

Destan di dema ku qewimîne de nemane. Di serdema nûjen de jî bandora wan li ser gelek şaxên hunerê têne dîtin. Li ser destanan xebatên rasterast û yê nerasterast hatine û tên kirinê. Bi awayê nerasterast destan, siya xwe li ser gelek berhemên hiştine. Ji van destanan hinek jê bandorekê li ser metnên nûjen jî hiştine. Ev rastiya bin bandora berhemên kevn û niha de mayîn bo kesên wek Hassanpour û Mokrî (Alan, 2013: 61) geşedaneke asayî têne dîtin. Ji bilî vana li ser destanên Kurdî gelek xebat hatine kirin. Tezên xwendevanan, pirtûk, gotar û di kilamên dengbêjiyê de bi qasî ku me xwe gihandinê destanên Kurdî çawa cih girtine em ê niha behsa wan bikin.

1.4.1. Tezên Di Derbarê Destanên Kurdî De

Li Tirkiyeyê piştî ku li çend zanîngehan, bi awayekî fermî beşên li ser ziman û edebiyata Kurdî vedibin, rêyên ku bi salan girtî mane, li pêş lêkolînên li ser ziman û edebiyata Kurdî vedibin. Di van salên dawiyê de li van zanîngehan, hejmareke zêde tezên ku bi zimanê Kurdî û li ser beşên ziman û edebiyata Kurdî radiwestin têne nivîsîn. Ji vana bi qasî ku me tesbît kirine yê ku li ser destanan hatine amadekirin ev in:

1. Feqiyê Teyran'ın ve Miradxanê Bayezidî'nin Zembilfroş Destanlarında Edebi Sanatlar, Jegr Najeb Abdulrazaq Bınavı, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî, 2017
2. Xebatek li ser Destana Derwêşê Evdî, Mehmet Şirin Filiz, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî, 2014
3. Li Gorî Axel Olric, Lord Raglan û Stith Thompson, Destana Memê Alan, Hawkar Jameel Mohammed, Zanîngeha Bingölê, Enstîtuya Zimanên Zindî, 2017
4. Regezên çîrokê di Mem û Zîna Ehmedê Xanî da, Sipan Salim Hasan Hasan, Zanîngeha Yüzüncü Yılê, Enstîtuya Zimanên Zindî, 2021
5. Berawirdîyek Li Ser Destana Memê Alan û Mem û Zîna Ehmedê Xanî Ji Alîyê Binyad û Honakê Ve, Volkan Korkmaz, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî, 2019

6. Translation and ideology: A study of paratexts of Turkish translations of the Kurdish Mesnevi, Seçil Töre, Zanîngeha Boğaziçiyê, Enstîtuya Zanistên Cîvaki, 2015
7. Motîfên Destana Siyabend û Xecê, Erkan Güneş, Zanîngeha Yüzüncü Yılê, Enstîtuya Zimanên Zindî, 2019
8. Destana Zembîlîfiroş û Gulxatûnê, Aziz Samur, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî, 2013
9. Kürtlerde Kültürel Bellek ve Destanlar; Dewrêş û Edûlê, Nesibe Güneyli, Zanîngeha İstanbul Bilgiyê, Enstîtuya Bernameyên Lîsansa Bilind, 2020
10. Hêmanên Îranî yê dîrokî û mîtolojîk di Mem û Zîn'a Xanî û Dîwana Melayê Cizîrî de, Morad Beroukî Milan, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî, 2019
11. Rengdana Folklorê di Destana Mem û Zîn ya Ehmedê Xanî da, Goran Ali Salim, Zanîngeha Yüzüncü Yılê, Enstîtuya Zimanên Zindî, 2017
12. Destana Kela Dimdimê û Xanê Lepzêrîn, Yaşar Kaplan, Zanîngeha Yüzüncü Yılê, Enstîtuya Zimanên Zindî, 2015
13. Binyadî Gêranewa lê Dastanî Mem û Zînî Oskar Mann û Şanoyî Memê Alanî Ebdurehîm Rehmî Hekarî (Lêkolînewekî Berawirdkariyê), Jameel Mohammed, Zanîngeha Bingölê, Enstîtuya Zimanên Zindî, 2017
14. Lêkolîneke Folklorî Li Ser Destana Mem û Zînê, Hikmettin Attı, Zanîngeha Mardin Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî, 2013

1.4.2. Pirtûkên di Derbarê Destanên Kurdî de

1. Fettah Ar, Destanên Kurdî 1-2, Weşanên Ar, Stenbol, 2021.
2. Ramazan Pertev, Folklor û Nasnameya Kurdî ya Neteweyî, Weşanên Avesta, Stenbol, 2018.
3. Sadiq Bahaeddîn Amedî, Folklorê Kurdî, Weşanên Lîs, Amed, 2013.
4. Ordîxanê Celîl, Celîlê Celîl: Destanên Me, Weşanên Wardoz, Amed, 2021.
5. Heciyê Cindî, Folklorê Kurmanciyê, Weşanên Lîs, Amed, 2016.
6. Hilmi Akyol, Antolojiya Çîrokbêj û Destanbêjan, Weşanên Şaredariya Bajarê Mezin a Amedê, Stenbol, 2014.
7. Shahîn Bekir Soreklî, Destana Dewrêşê Evdî, Weşanên Şemal, Stenbol, 2019.
8. Ahmet Aras, Siyabend û Xecê, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2019.

9. Roger Lescot, Memê Alan, Weşanên Avesta, Stenbol, 2020.
10. M. Said Ramazan el-Bûtî, Siyamend û Xecê, Weşanên Kent Işıkları, Stenbol, 2021.
11. Aras, Ahmet, Kerr û Kulik, Ahmet Aras, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2022.
12. Yaşar Kaplan, Beyt û Destanên Kurdî, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2019.
13. Necat Keskîn, Folklor û Edebiyata Gelêrî, Weşanên Avesta, Stenbol, 2019.
14. Wasfî Ak, Destan û Stranên Kurdî, Weşanên Sîtav, Enqere, 2019.
15. Ramazan Pertev, Edebiyata Kurdî ya Gelêrî, Weşanên Avesta, Stenbol, 2015.
16. Ramazan Pertev, Ji Destpêkê Heya Niha Folklorê Kurdî, Mardin Artuklu Üniversitesi Yayınları, Mêrdîn, 2013.
17. Eyüp Kıran, Dewrêşê Evdî, Kulîlka Bilbizêk û Rim, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2011
18. Hikmettin Attı, Lêkolîneke Zargotînî Li Ser Destana Mem û Zînê, Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê, 2013.
19. Ordîxanê Celîl, Kürt Kahramanlık Destanı Dımdım, Weşanên Avesta, Stenbol, 2001.
20. Îzzeddîn Mustafa Resûl, Bir Şair Düşünür ve Mutasavvıf Olarak Ehmedê Xanî Ve “Mem û Zîn”, Weşanên Avesta, 2007.
21. Ferhad Şakelî, Mem û Zîn’de Kürt Milliyetçiliği, Weşanên Dozê, Stenbol, 1996.
22. Ahmedê Xanî, Mem û Zîn, wer. Mehmet Emin Bozarslan, Weşanên Hasat, Stenbol, 1990.
23. Reşo Zilan, Serdar Roşan, Destanên Kurdî, Weşanên Weqfa Çanda Kurdî ya Stockholmê, Stenbol, 1996.
24. Zeynelabîdîn Zinar, Siyabend û Xecê, Weşanên Pencînar, Stokholm, 1992.
25. Ayhan Tek, Hamisiz Şair Babasiz Metin, Weşanên Nûbihar, Stenbol, 2018.
26. Yûsif Heşetî, Destan, Çîrok û Xebroşkên Colemêrgê, Weşanên Wardozê, Amed, 2020.
27. Şerefxan Cizîrî, Edebîyata Devkî û Şer, Weşanên Lîs, Amed, 2020.

28. Elî Teter Nêrweyî, Emîrxanê Lepzêrîn û Kela Dimdim Di Navbera Mêjû û Efsaneyê da, Weşanên Avesta, Stenbol, 2019.
29. Celilê Celîl, Zargotina Kurdên Sûrîyeyê, Weşanên Wardozê, Amed, 2021.
30. Şerefxan Cizîrî, Edebîyata Devkî û Şer, Weşanên Lîse, Enqere, 2020.

1.4.3. Gotarên Di Derbarê Destanên Kurdî De

1. Leyla Kaplan Li Gorî Çar Epîzotan Berawirdkirina Çar Varyantên Destana Zembîlfrîş, Nubihar Akademi, Cild 4, Jimar 13, 2020, 33-53.
2. Omeed Omeed, Sagvan Ahmed, Şopên Girêyên Derûnî di Destanên Kurdî Yên Folklorî da, Folklor û Ziman, Cild 3, Jimar 2, 2022, 145-170.
3. Osman Aslanoğlu, Di Mem û Zînê De Hunerên Mecazî, (2019), Şarkiyat, Cilt 11, Sayı 1, 2019, 137 – 149.
4. Yaşar Kaplan, An Assessment of Narrative Genres in Kurdish Folklore (Epos, Bayt and Narrative Songs), Araştırma Makalesi, (2022), International Journal of Kurdish Studies, Cilt 8, Sayı 2, 2022, 273 – 292.
5. İbrahim Tarduş, Taybetîyên Lehengên Tradîsyonel di Vegotina Kurdî de, Araştırma Makalesi, (2018), The Journal of Mesopotamian Studies, Cilt 3, Sayı 1, 2018, 57 – 76.
6. Remziye Aslan, Berawirdiya Destana Memê Alan û Mem û Zîna Ehmedê Xanî, (2015), International Journal of Kurdish Studies, Cilt 1, Sayı 2, 2015, 86 – 101.
7. Aram Roder, Hêmayên Homoseksuel û Karakterên Queer di Destana Memê Alanî da, Araştırma Makalesi, Folklor û Ziman, Cilt 1, Sayı 2, 2020, 61– 88.
8. Naci Özsoy, İlk Dönem Tasavvuf Kültüründe Horasan Melâmîliği ve Anadolu’da Bir Melâmî Karakter, Zembîlfrîş, Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, Cilt 2, Sayı 2, 2014, 85 – 99.
9. Michael Chyet, “Is Mem a hero? An Analytical Consideration of Oral Versions of ‘Mem u Zin’, Acta Kurdica 1, 1994, 155-176.
10. Mehmet Şirin Filiz, Xwendineke Berawirdî Ya Problema Xerabîyê Di Mem û Zîna Ehmedê Xanî û Othelloya Shakespeare De, The Journal of Mesopotamian Studies, Cilt 2, Sayı 1, 2017, 69-87.
11. Abdurrahman Adak, Akıf-i Vanî ve Aşık Osman Sipkî Ve A. Jaba Koleksiyonundaki Türkçe Mem û Zînleri, Şarkiyat, Cilt 10, Sayı 3, 2018, 1154-1181.

12. Nilay Kınay, Mem u Zin Mesnevisinde Ahlakî Değerler Üzerine Bir İnceleme, Ağrı İbrahim Çeçen Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü Dergisi, Cilt 8, Sayı 1, 2022, 113-127.
13. Zülküf Ergün, Invention of Xani's Mem û Zin As a Fundamental Work in Kurdish National Canon, Nubihar Akademi, Cilt 3, Sayı 9, 2018, 28-50.
14. İsmail Aksaz, Hasan Karacan, A View on The Story of Sêva Mîran, Cilt 5, Sayı 2, 2019, 490-502.
15. İbrahim Tarduş, Teybetiyên Lehengên Tradîsyonel Di Vegotina Kurdî De, The Journal of Mesopotamian Studies, Cilt 3, Sayı 1, 2018, 57-76.

1.5. RÊ û RÊBAZÊN LÊKOLÎNÊN LI SER DESTANAN

Di zanista folklorê de li ser lêkolîn û nirxandina berhemên folklorîk de xebat li gor hinek rê û rêbazan hatine kirin. Ev rê û rêbaz li ser çand û qadên xebatên yên cuda cuda de hatine sepandin. Navnetewîbûna van rêbazan vê derfetê daye destê lêkolîneran. Olric dibêje, naverokên vebêjeyên folklorîk dişibin hevdu. “Dema yek radibe edebiyata gel ya civakeke ku jê re biyaniye dixwine li cem wî, ew civak û vebêjeyên gelêrî yên wê civakê hesta beriya vê rastî hevdu hatine li cem wî çêdikin” (Yurtlu û Koçak, 2015: 1). Li gor vê nêrîna Olric, civak bêyî ku haya wan ji hev hebe û bêyî ku danûstandinek hebe di nav wan de naverokên berhemên wan dişibin hevdu. Ev nêrîn, yanê nêrîna hevbeşîya berhemên folklorîk jî me dibe nêrîna difûzyonîzmê. Li gor bizava difûzyonîzmê, “ruhê mirov li her derê heman e, yek e û ji ber vê taybetiya wî, di demê de, bêyî ji hevdu haydar bin dema hewcehî pê bibîne heman berheman diafirîne” (Oğuz, 2020: 71). Ji ber van sedeman em dikarin nêrîna navnetewîbûna rê û rêbazên lêkolînên li ser vebêjeyên folklorîk biparêzin. Motîfên ku ev vebêj di naverokên xwe de dihundirînin heman bin, heman vebêj dikarin li ser heman rêbazan bêne sepandin. Heya niha bi qasî ku me şopandiye di ti rê û rêbazên lêkolînên li ser vebêjeyên folklorîk de wek mînak, destan an çîrokeke Kurdî cih negirtine. Lê dîsa jî em dikarin weke vê xebata li ber dest, destan an çîrokên Kurdî li ser van rêbazan bisepînin.

Li ser vebêjeyên folklorîk, di qadê de li ber destê lêkolîneran hinek teorî hene. Em dikarin li gor van teoriyan, vebêjeyên ji bîra kurdan jî binirxînin, bisenîfînin û navek ji wan re bibînin. Folklorînasê kurd Hîkmet (2016: 26-105) van teoriyan wek Teoriyên Metîn Navendî, Teoriyên Avahîsazî/Struktûel û Teoriyên Kontekstî di nav xwe de

vediqetîne sê beşan. Ev teorî jî di nav xwe de vediqetin çend binbeşên dinê. Teoriya ku me xebata xwe li serê sepandiye wek Teoriya Motif Îndeksa Edebiyata Gel ya Stith Thompson derbas dibe di lîteratura cîhanî de. “Ev teori, di nav teoriyên metîn navendî de û di binbeşa teoriyên dîrokî-erdnîgarî de cih digire. Ji derveyî vê teoriyê, teroriya Alex Olrik ya bi navê Teoriya Zagonên Epîk û Kataloga Tîpên Çîrokan ya Antti Aarne jî di vê derê de cih digirin” (Oğuz, 2020: 77-80).

1.5.1. Rêbaza Li Gor Epîzotan

Peyva epîzotê di gelek şaxên hunerê yên wek şano, muzîk, sînema û edebiyatê de derbas dibe. Peyva epîzotê, ji bo destanê bi kurt û kurmancî em dikarin wek beşên jiyana leheng bi kar bînin. Bi vî awayî em dikarin her geşedanek ku di di jiyana leheng de pêk tê wek epîzotek bi nav bikin. Wek welidîn, nav lê danîn, perwerdehî, evîndarbûn, derketina xerîbiyê û hwd. Her çiqas xebata min li ser rêbaza lêkolînên li gor motîfan ve be jî min ji bo rêbaza li gor epîzotan jî pêwîstî bi kurtebehsekê dît. Di vê xebatê de min, ji bo rêbaza li gor epîzotan, dabeşkirin û şematizekirina epîzotan ya Ali Berat Alptekin ji xwe re wek bingeş qebûl kir. Alptekin, di xebata xwe ya berbelav ya li ser motîfên di çîrokên gel de, ji bo çîrokan epîzotên heyî di bin deh serenavan de hiltîne dest. Em dikarin ji bo destanan jî ji heman kategorîzekirinê sûd werbigrin. Di nav destanên ku di xebata min de cih girtine de destana ku ji van epîzotan herî zêde di naveroka xwe de di hundirîne destana Memê Alan e. Ji ber vê sedemê min tenê destana Memê Alan li gor vê şablona epîzotan nîşan daye. Ji bilî vê ji ber ku ji derveyî xebata me de ye, me hewcehî nedît tevahiya destanan li ser vê şablona epîzotan bisepînin.

1. *Malbata leheng*
2. *Welidîna leheng*
3. *Navlêkirina lehengan*
4. *Perwerdeya lehengan*
5. *Evîndarbûna lehengan*
6. *Rasthatina lehengan*
7. *Derketina xerîbiyê ya leheng*
8. *Daxwaza zewicandina hezkiriya leheng bi yekî din re*
9. *Vegera leheng ber bi welatê wî*
10. *Encam (Alptekin, 2021: 92-94).*

1. Malbata leheng

Di vê beşê de behs ji malbata leheng tê kirin. Wek mînak di destana Memê Alan de, bavê Mem û herdu apên wî her çiqas xwedî mal û desthilatdariyekê bin jî zarokek wan yê kur nîne. Ew bo berdewamkirina desthilatdariya malbata xwe ji Xwedê daxwaza kurikek dikin.

2. Welidîna leheng

Piştî ku ji Xwedê daxwaz û ricaya kurikek dikin, Xwedê, Xocê Xidir ji wan re dişîne. Xoce ji Elî Begê re dibêje biçe bi qîza Mîrê Qureyşîya re bizewice wê Xwedê kurekî bide te. Piştî ku xêr û xêratan didin, tam neh meh û neh roj û neh saet bi şûn de Xwedê kurekî dide Elî Begê.

3. Navlêkirina lehengan

Xoce Xidir, Elî Begê tenbî kiriye, gotiye heta ez li we beyan nebim hûn navekî li kurê xwe daneynin. Dema zarok tê dinê, ji meclîsa Elî Begê dixwazin navekî li kurê wî deynin. Lê Elî Beg ji gotina Xoce Xidir dernakeve. Piştî ku Xoce Xidir li wan dibe mêvan navê Memê Alan lê datîne û diçe.

4. Perwerdeya lehengan

Ji bo ku leheng yekta û bijarte ye divê perwerdehiyeke baş bigre. Elî Beg ji bo perwerdeya kurê xwe melayekî duwazdeh ilmî digre û jê dixwaze ku kurê wî perwerde bike.

5. Evîndarbûna lehengan

Mem û Zîn di xewna xwe de hevdu dibînin û dibin evîndar.

6. Rasthatina lehengan

Mem û Zîn piştî xewna ku hevdu cara ewil dibînin nexweş dikevin. Memê Alan ji malê destûr dixwaze ji bajarê Mixribîyan dikeve rê tê bajarê Cizîrê bo dîtina Zînê. Li Cizîrê hevdu dibînin û digihîjin hevdu.

7. Daxwaza zewicandina hezkiriya leheng bi yekî din re

Di rêza epîzotên Alptekin de ev epîzot di destana Memê Alan de piçek di şiklekî cuda de be jî wek astengek Zîn bi yekî din re bi Çekoyê pismamê xwe re dergistî ye. Mem divê bo gihîştina mirazê xwe vê astengê jî ji holê rake.

8. Vegera leheng ber bi welatê wî

Di destana Memê Alan de ji bo ku evîneke bêmiraz heye epîzoteke bi vî awayî cih nagire. Di çi destanek ber destê me de epîzoteke bi vî awayî nîne.

9. Encam

Di dawiya destanên ber destê me de ji bo evîndaran evîneke bêmiraz heye. Evîndar di rêya evîna xwe de canê xwe ji dest didin.

1.5.2. Rêbaza Li Gor Motîfan

Ji bo lêkolînên li ser destanan rêbaza ku min ji bo xebata xwe bijartîye rêbaza li gor motîfan e. Di rûpelên pêşî de ji ber ku min behsa vê rêbazê kiriye, bo nekevim dûbareyê li vê derê hewcehî bi gotineke dirêj nabînim.

BEŞA DUYEM

MOTÎF-INDEX of FOLK-LITERATURE

2.1. MOTÎF

Di bîra min de ye, bêyî ku hay û hêviya min ji motîfa di berhemên folklorîk de hebe, dema min cara ewil peyva motîfê bihîst, motîfên li ser merş û tejên malan hatin bîra min. Dû re dema ketim dû vê peyvê têgihîştim ku di navbera motîfa di hişê min de û motîfên di berhemên folklorîk de cih digirin de cudahiyeke ewqasî mezin tune bûye. Çawa ku motîfên li ser merşan merşekê temam dikan, yanê çawa ku merş ji van motîfan pêk tên, di vegotinên gelêrî de jî her vegotin ji motîfan pêk tên. Motîf di van vegotinên de yekeya herî biçûk ya xwedî wate ye. Peyva motîfê, peyveke Frensî ye û ji hêla etîmolojîk de ji *'motivum'* a Latînî tê. Ev peyv tenê ne di qada edebiyatê de, di hinek şaxên hunerê de jî derdikeve pêşiya me. Di vegotinên bîra gel de ji bo em tiştek wek motîf bi nav bikin divê derasayiyek tê de hebe. Ev derasayîbûn di leheng, bûyer û dem û mekanê de ango kurt û kurmançî dibe ku di her bûyerê de derkeve pêşiya me. Destan, çîrok, efsane çi zêde çi kêm di naveroka xwe de hinek motîfan dihewînin. Ji ber ku di binyada xwe de derasayîbûn û balkêşbûnekê dihewînin bi xêra serê van motîfan e, ev vegotin li hember jibîrbûnê hebûna xwe diparêzin.

Lêkolînerê Emerîkî Stith Thompson (z.1885, m.1976), di qada folklorê de bi xebatên xwe navek li dû xwe hiştiye. Li gor gotina Dorson (Aslan, 2011: 33-45), "Thompson bi xebatên xwe wek 'bavê folklorê' hatiye naskirin". Thompson, berhema xwe ya bi navê *The Motif-Index of Folk Literature* (Motîf Indexa Edebiyata Gel) cara yekem di navbera salên 1932 û 1936an de çap kiriye. Piştî vê çapê bi lêzêdekirinan û revîzekirinê di navbera salên 1955 û 1958an de wekî 6 cîld cara duyem çap kiriye. Di rûpela pêşîn ya berhemê de serenavek bi vî awayî heye: *"Senifandineke Çîrok, Kilamên Dirêj, Mît, Fabl, Çîrokên Serdema Navîn, Pirtûkên Henek û Parçeyên Vebêjî yên Di Efsaneyên Herêmi De"*. Weke ku ji serenav jî diyar e çarçoveya berhemê ji ev cureyên vebêjeyên edebiyata gel pêk tê. Ji ber ku destan, ji aliyê naverokî de heman weke motîfên di çîrokan de peyda dibin di naverokên xwe de dihewînin lêkolîner dikarin li ser destanan jî ji vê xebatê sûd werbigirin. Thompson di vê xebata xwe de bi awayekî sistematîk, motîfên di ev cure berhemên ku me li jorê behs kirine de peyda dibin di berhema xwe de ji tîpa Ayê heya tîpa Zyê di 23 serenavan de senifandiyê. Helbet di vir

de motîf li gor derasayiya xwe û bi bandora xwe ya di berheman de bo behsê cihek ji xwe re digrin. Li gorî fikra Thompson (Hikmet, 2016: 42) “divê taybetmendiye baldar û derasayî yê motîfan hebin”. Di derbarê motîfan de Thomson wuha dibêje:

Di çîrokê de bûyîna dê motîfek nîne. Lê dêya xayîn, dêmarî dikare bibe motîfek. Lewra qet nebe ew, weke tiştekî nedîtî hatiye fikirîn. Bûyerên asayî yê jiyanê motîf nînin. ‘John, cilan li xwe kir û ber bi bajêr meşîya’ gotin, di derbarê bibîr anînê de motîfek jî nahewîne, lê ‘leheng şewqeya xwe ya ku pê tune dibe da serê xwe, li merşa xwe ya efsûnî rûnişt û ber bi welatê li rojhilatê rojê, rojavayê hîvê çû’ gotin, herî kêr çar motîfan, yanê şewqe, merş, welatê tîkûz, rêwîtiya efsûnî ya hewayî di hundirîna (Oğuz, 2020: 84).

Dîsa Thompson, motîfê wek “di çîrokê de yekeya herî biçûk ya ji berê de xwedî qabiliyeta mayî” (Sakaoğlu, 1980: 24), bi nav dike. Wî di xebatên xwe de motîfên ku di naveroka xwe de derasayiyek nahewînin ji motîfên din neqandine û di senifandina xwe de wan wek motîf nehesibandine. Thompson motîfên ku balkêşî û derasayiyek di naverokên xwe de dihevin di 23 sernavan de senifandiye. Ew jî ev in:

- A. Motîfên Mîtolojîk
- B. Ajal
- C. Qedexe
- D. Sêhr
- E. Mirin
- F. Bûyerên Derasayî
- G. Dêw
- H. Îmtihan
- Î. Jîr û Xêt
- J. Xapandin
- K. Vajîbûna Qederê
- L. Diyarkirina Pêşerojê
- M. Sihûd û Qeder
- P. Civak
- R. Girtî
- S. Tehdeyiyên Neasayî
- T. Zewicîn
- U. Xwezaya Jiyanê
- V. Ol

W. Taybetiyên Lehengan

X. Pêkenîn

Z. Motîfên Curbecur

Piştî ku ev xebat ji aliyê Thomson de tê amade kirin ji wê jî digihîje ber destê lêkolîneran, rastî hinek rexneyan hatiye. Thompson her çiqas jimareke gelek zêde ji mînakên motîfan li ser MIFLê zêde kiribe jî em dikarin bibêjin ku berhema wî hê nehatiye temam kirin. Di nav çavkaniyên li ber destê lêkolînerên folklorê de MIFL, di nav xebatên herî berfireh û kêrhatî hatiye hesibandin. Di serenavê binî yê Motif Indexê de di çarçoveya xebatê de kîjan cure hene yanê bi gotineke din ev rêbaz li ser kîjan cureyên vegotinên gelêrî karîger e hatiye diyar kirin. Di listeya motîfan de hinek cih wek jimar bi zanebûn vala hatine hiştin. Ev valahiştin ji bo lêzêdekirinên dû re derfetek dide destê lêkolîneran. Ji xwe nê pêkan bûye ji bîra tevahiya netewên cîhanê mînak berhev bike û tevli xebata xwe bike.

Di aliyê karîgeriya MIFLê de lêkolîner hinek kêmasiyan tesbît kirine û rexneyên xwe li vê rêbazê kirine. Alan Dundes (1998: 130-135), MIFLê ji ber ku çîrokên ji navê berjêr (mustehcen) hilnedaye û ji ber ku çîrokên derbarê efrîdan de piştçav kiriye rexne kiriye. Lê pê re jî derbarê vê berhemê de dibêje, bi van kêmasiyên xwe re di danasîna çîrokên gel de hê jî çavkaniya herî baş e. Hîkmet (2016: 41) jî di derbarê rêbazê de hinek tişt gotine. Bi ya wî:

Bêguman dema em bala xwe didin wan, tê dîtîn ku di watedarkirina van motîfan de, yanê di tesbîtîkirina fikrîyata civakî ya li dû van motîfan de, kêmasiyek heye, lewra eger ew motîf bin, yanê bi serê xwe tematîk bin, divê temaya li dû wan jî bê nîşandan. Her wiha kêmasiyeke di jî ew e ku ew bi giranî li ser hin herêmên diyar mijûl bûye û motîfên gelekî deverên girîng li derveyî vê ansîklopediyê mane.

Karagöz (2019: 75-90), di derheqa hinek kêmasiyên ku di berhemê de tene dîtîn û çareser kirina van pîrsgirêkan de hinek pêşniyar li bikarhênerên berhemê kirine. Bi ya wî ‘lêkolînerên ku xebatên xwe li ser vê rêbazê saz dikin dikarin li xebatê hinek lêzêdekirinan bikin’. Di MIFLê de ev bi nimare kirinên nû pêkan e. Dema em li rexneyan dinîhêrin em dibînin ku berê rexneyan li derekê kom dibin: Çima di MIFLê de tenê ji bîra hinek gelan mînak hatine girtin û çima hinek cure çîrok hatine sansur kirin? Bi van rexneyan re em dikarin bibêjin ku xebata Stith Thompson ji bo lêkolînerên ku li ser folklorê Kurdî dixebitin berhemeke xwedî qîmet e. Ne tenê di tesbîta motîfên di destanan de, di çîrok, mît, efsaneyên bîra gel de jî lêkolîner dikarin ji vê berhemê sûd werbigirin.

2.2. MOTÎFA ÎMTIHANÊ

Ji ber ku bi mijara xebata min re têkildar e ez dê ji van motîfan bes li ser motîfa îmtihanê rawestim. Îmtihan peyvek Erebi ye û ji Erebi derbasî zimanê Kurdî û herwiha zimanê Tirkî û Farisî jî bûye. Peyv di zimanê Erebi de ji rayeka -mhn- (محن) tê. Ku ew jî di wateya “ceribandin, îmtihan, lêdan, li xwe kirina cilan heta ku kevn bibin, bi rêya nermkirinê dirêjkirina çerman û derxistina axa binê bîrê” (Kaya, 2002:11) de ye.

Mirov di tevahiya jiyana xwe de tim rastî îmtihanên tên. Hinek bi sebra xwe, hinek bi zanînen xwe, hinek bi nefsa xwe tene îmtihanê kirin. Sedema hebûna îmtihanên di aliyek de bijartin e. Bijartina yê baş, bijartina yê ji bo wî karî herî layiq, ji bo zewacê bijartina namzedên herî baş, yê herî zana an herî bawermend. Ev dinya ji bo bawermendan weke cihê îmtihanê hatiye dîtin. Xwedê ji bo ji nav evdên xwe yê baş bineqîne vê dinyayê weke cihê îmtihana evdên xwe afirandiye. Xweda di Quranê de wuha ferman kiriye li evdên xwe: “Ew ê ji bo ku we biciribîne, ka ji we kî karên qenc dike, mirin û jiyan xuliqandiye, ew e.” (Quran: 67/2). Dema em lê dinîhêrin di vir de jî armanc û felsefeya hebûna îmtihanê di rastiye de me dibe bijartinê. Di vebêjeyên gel de jî heman weke di jiyana rastî de heye, leheng ji bo biserketina di karek de an bijartina ji nav reqîban de rastî hinek îmtihanên tên.

Di vebêjeyên gel de jî leheng tim rastî hinek astengan tên. Li hember leheng rêyên dijwar ku divê bêne derbas kirin hene. Neyarên dijwar, karên bêderfet, keçika li dûr, an keçika ji çîna bijare. Ev bi giştî wek asteng di rêya leheng de peyda dibin. Lê leheng bi piranî li rû xwe alîkaran dibînin. Ev alîkar an mirovê pîroz e, an weke ku di piraniya vebêjeyên Kurdî de derdikeve pêşiya me pîrek e an hesp an jî hevaleyê baş e. Ev alîkar di pêkanîna îmtihanê de xwedî formeke erênî ne. Aqûbeta îmtihanê li gor şiyana van alîkaran diguhere. Di destana Kela Dimdimê de ji aliyê civakê de barekî giran li piştê Xano hatiye bar kirin. Hest û daxwazên civakê li kesayeta Xano hatine bar kirin. Li hember vê îmtihana dijawabêrê Xano têkçûna civaka wî ye, serkeftinê jî serkeftina civaka wî ye. Di vebêjeyên gel de îmtihan di qalibên cuda cuda de derdikevin pêşiya me. “Otto Rank, Lord Raglan di vebêjeyên gel de ji bo lehengan qalibên çêkirine” (Balkaya, 2015: 21-22). Di şematîze kirina qalibên ya herdu lêkolîneran de jî leheng ji bo serkeftinê di heman rêyê de dimeşin û bi heman îmtihanê re rûbirû dimînin. Ev qalib jî bi hinek lêzêdekirin an guherînan di hemûyê vebêjeyên netewan de tene peyda

kirin. Stith Thompson di MIFLê de ev cureyên îmtihanên ku di vebêjeyên gel de peyda dibin di binê serenavê îmtihanê de senifandine. Em ê niha derbasî wan mînakên bibin.

2.2.1. Di Motif Indexê De Mînakên Motîfên Îmtihanê

Thompson, di vê xebata xwe ya navborî de motîfa îmtihanê di rêza 8an de bi tîpa Hyê nîşan daye û vê motîfê ji H0ê heya H1599an senifandiye û wek îmtihanên nasnameyê, îmtihanên rastiyê, îmtihanên zewacê, îmtihanên jîrekiyê, îmtihanên qabîliyetê û îmtihanên dinê di 6 serenavan de rave kiriye. Di binê van 6 serenavan de jî behsa hinek motîfên dinê kiriye. Thompson ji bîra gelên cîhanê mînakên girtiye û li gor van mînakên, serenavan li cureyên motîfan daniye. Di Motif Indexê de mînakên motîfên îmtihanê ji vana pêk tên:

H0 – H199. Îmtihanên Nasnameyê: Naskirin

H0. Îmtihanên Nasnameyê

H10. Naskirina Bi Rêya Agahiyên Hevpar

H20. Naskirina Bi Rêya Şibandinê

H30. Naskirina Bi Rêya Taybetiyên Kesayetî

H50. Naskirina Bi Rêya Nîşaneyên Laşî An Jî Taybetiyên Şiklî

H80. -H149 Naskirina Bi Rêya Nîşandankan

H80. Naskirina Bi Rêya Nîşandankan

H90. Naskirina Bi Rêya Xemlê

H100. Naskirina Bi Rêya Temamkirina Parçeyên Jetonê

H110. Naskirina Bi Rêya Caw û Cilan

H120. Naskirina Bi Rêya Nîşandankan

H150. Şert û Mercên Naskirinê

H200. – H299. Îmtihanên Rastiyê

H210. – H239. Îmtihanên Sûcdarî an Pakiyê

H210. Îmtihana Sûcdarî an Pakiyê

H220. Îmtihanên Dijwar

H240. Îmtihanên Rastiyê yê Dinê

H300. – H499. Îmtihanên Zewacê

H300. Îmtihanên Derbarê Zewacê De

H310. – H359. Îmtihanên Xwezgîniyê

H310. Îmtihanên Xwezgîniyê

H360. – H399. Îmtihanên Bûktiyê

H360. Îmtihana Bûktiyê

H400. – H459. Îmtihanên Keçaniyê

H400. Îmtihana Keçaniyê

H410. Îmtihana Keçaniyê Bi Tiştên Efsûnî An Bi Îmtihanên Dijwar

H430. Rêza Keçaniyê

H440. Nîşaneyên Din Yê Keçaniyê

H460. Îmtihanên Jin û Mêriyê

H480. Îmtihanên Baviyê

H490. Îmtihanên Din Yê Zewacê

H.500. – H899. Îmtihanên Jîrekiyê

H500. Îmtihana Jîrî An Kêrhatîbûnê

H510. Îmtihanên Texmînê

H.530. – H899. Têderxistinok

H540. Pêşniyarkirina Têderxistinoka

H570. Rêyên Çareserkirina Têderxistinoka

H580. Vegotinên Efsûnî

H600. Şîroveyên Sembolîk

H620. Pîrsgirêka Çareser Nebûyî: Dawî ya Efsûnî ya Çîrokê

H630. Têderxistinokên Serdest

H660. Têderxistinokên Danberhevê

H680. Têderxistinokên Dûrahiyê

H690. Têderxistinokên Giranî û Pîvanê

H700. Têderxistinokên Jimarê

H710. Têderxistinokên Qîmetê

H720. Têderxistinokên Mecazî

H.770. Têderxistinokên Ravekirinê

H790. Têderxistinokên Derbarê Şert û Mercên Derasayî De

H810. Têderxistinokên Têkildarê Încîl û Efsaneyan

H840. Têderxistinokên Din

H900. – H1199 Îmtihanên Qabîliyetê

H900. – H999. Dana Erkan û Encam

H900. – H949. Tayînkirina Erkan

H900. Erkên Danî

H910. Weke Bersiva Pêşnîyarê Dana Erkan

H920. Danerên Erkan

H940. Dana Erkan

H1050. – H1089. Erkên Paradoksî

H1050. Erkên Paradoksî

H1090. Erkên Ku Lezeke Derasayî Jê Re Divê

H1110. Erkên Acizker

H1130. Erkên Ser Hêza Mirov

H1150. Erk: Dizî, Bidestxistin an Kuştin

H1180. Erkên Curbecur

H1200. – H1399. Şert û Mercên Derbarê Erkan De

H1200. Erk

H1210. Erk Hat Dayîn

H1220. Erka Xwebexşî Tê Stendin

H1240. Şert û Mercên Din Yên Erkan

H1250. – H1399. Xwezaya Erkan

H1250. Gera Li Pey Dinyayeke Din

H1280. Erkên Li Pey Alemên Din

H1300. Gerên Bêminak

H1320. Gera Li Pey Tişt û Ajalên Têkûz

H1360. Gera Li Dû Ajalên Dirinde

H1370. Erkên Curbecur

H1400. – H1599. Îmtihanên Dinê

H1440. – H1449. Îmtihanên Tirsê

H1410. Îmtihana Tirsê: Mana Li Cihek Tirsna

H1550. – 1549. Îmtihanên Berxwedaniyê û Hêza Mana Li Dinê

H1500. Îmtihanên Berxwedaniyê

H1550. Îmtihanên Kesayetan

H1570. – H1599. Îmtihanên Curbecur

Di Motif Indexê de minakên motîfên îmtihanê ji vana pêk tên. Helbet pêkan nîne em tevahiya minakên motîfan di naveroka destanên Kurdî de jî bibînin. Ji xwe ev berhem tiştek wuha îdia nake. Weke me li jorê jî gotî ev minakên di vir de cih girtî tenê ji berhemên hinek welatan hatine girtinê. Lê weke ku em ê di beşa pêşî de bibînin, her çiqas rasterast ji destanên Kurdî minakên motîfan di vê xebatê de cih negirtibin jî di şîbhê wan de minakên motîfan, di van destanan de hatine tesbît kirin. Em ê niha di beşa dawîya xebata xwe de minakên ku me ji destanên Kurdî bijartine nîşan bidin.

BEŞA SÊYEM

DI DESTANÊN KURDÎ DE MOTÎFA ÎMTIHANÊ

3.1. GUHERTOYÊN DESTANÊN DI VÊ XEBATÊ DE CIH GIRTINE

Di vê beşê de ez ê ewilî behsa mînakên destanên ku di vê xebatê de cih girtine bikim û li gor rêbaza Stith Thompson, mînakên motîfên îmtihanê yên ku di destanên Kurdî de cih girtine nîşan bidim. Di xebata xwe de min, cih daye 8 destanên herî berbelav yên Kurdî. Memê Alan, Siyabend û Xecê, Derwêşê Evdî, Zembîlfiroş, Kerr û Kulik, Binefşa Narîn û Sêva Heciya û Kela Dimdimê. Ji bo hêskirîna ez ê di bin sernavan de tenê tîpên serî yên navê destanan bi kar bînim. Wek Memê Alan (DMA) Siyabend û Xecê (DSX), Ker û Kulik (DKK), Derwêşê Evdî (DDE), Binefşa Narîn (DBN), Destana Sêva Heciya (DSH), Destana Zembîlfroş (DZ) û Destana Kela Dimdimê (DKD).

3.1.1. Destana Memê Alan

Di nav destanên herî berbelav yên Kurdî de destana herî ewil ku em ê behsa wê bikin destana Memê Alan e. Di demajoya xwe gihandina çavkaniyên derbarê destanan de, destana herî zêde ku derbarê wê de çavkanî bi ber destê me ketin ev destan e. Li ser guhertoyên vê destanê gelek berhem hatine nivîsîn. Lê ji vana ya herî berbelav Mem û Zîna Ehmedê Xanî ye. Xanî di terzê mesnewiyê de bi navê Mem û Zînê berhemek nivîsandiye. Celadet Elî Bedirxan di derbarê giringiya vê destanê de, di nav rûpelên kovara Ronahiyê de wuha gotiye:

“Di folklorê me de, bêşik şaheser Memê Alan e. Memê Alan malê miletekî Ewropayî biwa Xwedê dizane di heqê wê de heta niho çend cild kitêb dihatine nivîsandin” (Perteve, 2018: 299).

Bi qasî ku me xwe gihandiye çavkaniyên derbarê vê destanê de, ev destan ji Cizîra Botan derketiye û di nav kurdan de belav bûye. Bûyer li dor qesra Mîrê Cizîrê qewimîne. Guhertoya ku me ji bo xebata xwe bijartiye guhertoya ku Roger Lescot derbasî nivîsê kiriye. Ji derveyî vê guhertoyê di devê dengbêjan de, di nav rûpelên pirtûkan de gelek guhertoyên vê destanê peyda dibin.

Kurteya Destana Memê Alan

Li bajarê Mixribê bi navê Elî Beg, Emer Beg û Elmaz Beg sê bira hebûne. Desthilatdariya bajarê Mixribê di destê van her sê birayan de bûye. Ev her sê birayên temen mezin bê zaro bûne. Bo domandina desthilatdariya xwe tenê xwesteka wan zarokek bûye. Piştî demeke dirêj Xwedê zarokek kurik daye Elî Begê. Elî Beg bi Xoce Xizir dişêwire û navê Memê Alan li kurê xwe dike. Memê Alan ji behrê hespeke avî tîne kedî dike û navê Bozê Rewan lê dike. Ev hesp li derdora bi sadiqbûna xwe ya ji xwediyê xwe re û bi jêhatîbûn û bêhemtatiya xwe navdar dibe. Siwarê Bozê Rewan vediguheze Memê Alan mîrê kurdan. Li aliyê dinê li bajarê Cizîrê jî walîtiya bajêr di destê Mîr Ezîn de bûye. Bi navê Zînê xwengeka Mîr Ezîn hebûye mîna hîva çardeşevî. Şevê Memê Alan û Zîna Zêdan dikevin xewnên hevdu û bi hev gûstilan diguherînin. Piştî vê xewnê Zîn ji mereqa Mem ji hal de dikeve. Mem jî ji apanê xwe destûrê dixwaze dikeve ser rêya Cizîrê. Piştî rêwîtiyeke dirêj digihîje Cizîrê û rasterast diçe nav malên eşîra Celaliyan, mala pismamên Zînê. Hesen, Çeko û Qeretaçîn sê pismamên Zînê ne ku ji nav vana Çeko bi dotmama xwe Zînê re dergistî ye. Ev hersê bira di nav hev de sond dixwin dibêjin xwesteka ku Memê Alan padîşahê kurdan aniye heta mala me her çi be em ê bînin cih. Dû re hîn dibin ku Mem ji bo dotmama wan Zînê ku dergistiya Çeko ye hatiye heta wê derê. Çeko di serî de li hember derdikeve lê dû re gotina birayê xwe yê mezin dike. Beko bi vana dihesê û vê xeberê digihîne kekê Zînê, Mîr Ezîn. Mîr radibe pismamên xwe dişîne seferê û li gor pêşniyara Beko li ser Zînê bi Mem re dikeve lîstika şetrencê. Dû dek û dolavên Beko, Mîr ji Memo dibe û wî davêje zîndanê. Memo piştî sê rojan di zîndanê de dimire û piştî wî bi heft rojan jî Zînê dimire. Ji bo ku bûye sedema mirazên wan Mîr fermana kuştina Beko dide. Memê Alan û Zîna Zêdan li bajarê Cizîrê binax dikin. Piştî ku li bajarê Mixribê kuştina Memo tê bihîstin nas û dostên Memê Alan digrin ser bajarê Cizîrê. Bo tola Memê Alan bajar tune dikin û vedigerin welatê xwe.

3.1.2. Destana Siyabend û Xecê

Destana Siyabend û Xecê jî weke destana Memê Alan li serê gelek xebat hatine kirinê û di gelek kilamên dengbêjiyê de cih girtiye. Bi qasî ku me lêkolaye, ev destan jî di nav destanên herî berbelav yê kurdan de cih digire. Ahmet Aras guhertoyek vê destanê (Aras, 2019) bi awayê pexşankî derbasî nivîsê kiriye. Ji bo vê xebatê ev guherto

esas hatiye girtin. Destana Siyabend û Xecê baş nayê zanîn ku li ku derê qewimiye. Lê li gor baweriya giştî ev destan ji herêmeke nêzî quntarên çiyayê Sîpanê belav bûye. Ev destan ji hêla motîfên îmtihanê de pir dewlemend e.

Kurteya Destana Siyabend û Xecê

Siyabend piştî ku dikeve salên xwe yê heştan li bajarê Silîva nexweşînek derdikeve. Dê û bavê wî, xûşk û birayên wî bi hev re bi wê nexweşîne dikevin û dimirin. Siyabend sêwî dimîne û xwe dispêre apê xwe û amojna xwe. Ap û amojnên Siyabend li wî tehdeyiyan dikin. Amojnê weke dêmariyek wî tî û birçî dihêle. Piştî ku Siyabend hinek mezin dibe wî dikin golikvanê gund. Li pêş Siyabend golîkek piyê wê li kevir dikeve û kulek dibe. Ji wê bonê apê wî li wî dixê. Ew jî radibe ji gund, ji mala apê xwe firar dike. Şevê kalekî rûsipî dikeve xewna wî hespek dide wî. Dema Siyabend şiyar dibe li wê hespê siwar dibe û ber bi Serhedê dajo. Diçe li ser rê bi navê Qedê bi yekî re dibe heval. Bi Qedê re terş û talanê dikin. Rojek li nêzî xwe li konekî dibin mêvan. Di kon de keçîkek heye ku Siyabend dil berdidiyê. Navê keçîkê Xeca Mamo ye û xwîşka heft birayan e. Birayên Xecê dema tî malê li gor xwesteka xwîşka xwe, wê didin Siyabend. Siyabend diçe bajêr bo danûstandinên dawetê. Eşîra Sipkiyan digrin ser konê birayên Xecê. Heft birayên Xecê destebirakê Siyabend, Qedê dikujin û Xecê direvînin. Dema Siyabend vedigere ji bajêr ji devê Qedê yê birîndar bûyerê fêr dike. Xwe davêje ser pişta hespa xwe Hêşînbozê Surê û dikeve dû wan. Li gundê ku Hesên Axa, Xecê revandiye dibe mêvanê pîrekê. Pîrê alîkariya wan dike. Di dema dawetê de Siyabend digre ser dawetê û Xecê ji destê wan xilas dike û dide ser rêya Çiyayê Sîpanê. Li qûntara çiyê çend heb gakuwî dibînin. Siyabend bo Xecê dide dû wan tîrê li yek ji wan dixê. Dema ku wê serjê bike, gakuwî qiloçê xwe li Siyabend dixê û wî ji helan de gêrî jêrê dike. Siyabend dişiqite û birîndar dibe. Xecê dikeve pey Siyabend û wî li wê newalê birîndar dibîne. Ew jî xwe ji jor de davêje û li rû Siyabend canê xwe ji dest dide. Gundî tî û gora herduyan li rû hev dikolin. Tê gotin ku her bihar li ser gora wan du kulîlk hêşîn didin û gakuwîyek tê serê wan herdu kulîlkan diqurmiçîne.

3.1.3. Destana Derwêşê Evdî

Destana Derwêşê Evdî ji hêla naveroka xwe de hem dikeve çarçoveya destanên lehengiyê hem jî dikare di çarçoveya destanên evîniyê de bê dîtin. Weke ku ji naveroka destanê jî diyar dibe ev destan ji nav eşîra Milan û eşîra Şerqiyan de derketiye holê. Ji

destanên dine cudatir di vê destanê de motîfa olî jî cih digire û di dawiya destanê de bêyî cudatîyên di nava wan de bibe sedema ji hev dûrketina wan ji bo kurdan peyama yekîtiyê tê dayîn. Lêkolîner M. Şirin Filiz di xebata xwe (Filiz: 2014) ya li ser vê destana Derwêşê Evdî de behsa 10 guhertoyên vê destanê dike. Ji bo vê xebata me guhertoya Baqî Xido ya ku ji aliyê Shahîn Bekir Soreklî (Soreklî: 2019) ve derbasî nivîsê bûye esas hatiye girtin. Di destanê de ji bo motîfa îmtihanê gelek mînak hetine tesbît kirin.

Kurteya Destana Derwêşê Evdî

Derwêşê Evdî kurê Evdî Milhimê Êzdî ye. Ji eşîra Şerqîyan e. Dilê wî dikeve Edûle ya keça paşayê eşîra Milan. Lê serokê eşîra Milan li hember derdikeve naxwaze keça xwe bide lawekî êzdiyan. Eşîra Milan bi tirk û gêsan re di rewşa cengê de ne. Serokê eşîra Milan difikire biryar dide dibêje kî biçe bi van neyaran re şer bike û ji şer bi silametî vegere wê Edûleya xwe bide wî. Armanca wî helbet ew e ku bi kirina xwe derbeyek li Derwêş bixe. Dibêje wî em di nav millet de rezîl kirin. Vêca ji bo tola xwe bigirim dor niha dora min e. Ev xeber digihîje Derwêşê Evdî. Bavê Derwêş Evdî Milhim çiroka xwe û ya eşîra Milan ji kurê xwe re dibêje. Behsa qelaşîya wan dike. Ji bo kurê xwe razî bike ku neçê wê fîncanê bi ser xwe de neke çî ji destê wî tê dike. Lê Derwêş gotina min gotin e dibêje, bi birayê xwe Sehdûn û çend hevalên din re dikevin rê diçin nav eşîra Milan. Beriya ku ew bigihîje wê derê Edûle derdikeve dîwanê û bo ji nav eşîra Milan yek fîncanê bi ser xwe de bike çî ji destê wê tê dike. Lê ji ber ku bavê wê li hemeşîrên xwe şîreta ranekirina fîncanê kiriye yek ranabe wê fîncanê ji ser sêniyê nagire. Axir Derwêş digihîje binê konê wan. Li dora Derwêş birayê wî Sehdûn û 4 kesên ji eşîra Milan hene. Piştî ku di civînê de fîncana qehweyê digêrin ji rûniştvanên wê dîwanê çî kesek wê qehwê bi ser xwe de nake. Kî ku rabike wê biçe bi gêsan û tirkan re şer bike. Derwêş xwe dirêj dike wê fîncanê û qehwê bi ser xwe de dike. Li hember ewqas rica û lavayan ber xwe dide, Edûleyê di wî halê girî de dihêle û bi 11 kesan re berê xwe dide nav qada şer. Li hember wan artêşek ji sê hezar hefsed kesî pêk dihê heye. Her carek yek ji wan dibe hedefa şûr û mertalan û herî dawiyê Derwêş jî li dû hîleyên Kose Weys bi hespa xwe hedban heta welatê mişkan diçe. Li wê derê lingê hedban dikeve kortika mişkê û ji hespa xwe de dikeve erdê. Xebera mirina wan digihîje êlên wan û girîn û fîzan bi hezkiriyên wan dikevin. Piştî ku ev xortên wan ji aliyê artêşa

tirk û gêsan ve têne kuştin eşîra Milan û eşîra Şerqîyan di nav xwe de peymanekê çêdikin, hêza xwe yek dikin û tirk û gêsan têk dibin.

3.1.4. Destana Kerr û Kulik

Destan weke Kerr û Kulik an li gor hinek guhertoyan destana Kerro û Kulik tê zanîn. Di vê destanê de weke destana Derwêşe Evdî hinek motîfên hevpar cih digirin. Weke motîfa rakirina fîncana qehweyê û dû re jî ji bo hezkiriyê çûna ser neyaran. Di radyoya Erîvanê de Zadîna Şakir, Egîdê Têcir, Mehmûdê Eliyê Temoyê Teto li ser hinek guhertoyên ve destanê strane. Me ji bo vê xebata xwe guhertoya ku Ahmet Aras (Aras: 2022) weke pexşankî derbasî nivîsê kiriye esas girtiye.

Kurtiya Destana Kerr û Kulik

Silêman û Emer Axa du bira ne di nav eşîra Milan de. Emer Axa li birayê xwe Silêman tehdeyîyan dike. Ji ber vê bonê Silêman lê dixê ji cem wan diçe nav eşîra Gêsiyên ereb. Silêman li wê derê dizewice. Lê dîsa vedigere nav êla xwe. Li wê derê ji wî Werdekê re du kur çêdibin. Navê yekî datînin Kerr navê yê din jî Kulik. Silêman dimire û herdu kur li cem diya xwe dimînin. Emer Axa li wan niheqiyê dike û dixwaze ji wan xilas bibe. Radibe listikek tîne serê wan. Dibeje ez ê fîncaneke qehwê bigerînim di nav dîwanê de. Yê ku vê fîncanê bi ser xwe de bike divê biçe hespa Elî Îsanê ya bi navê Herbozê ji nav eşîra Gêsiyan bineqîne û bîne ji min re. Dema ev kes sax vegeriya ez ê keça xwe Şemsê bidim wî. Dilê Kulik di Şemsê de ye. Ji vê bonê radibe fîncanê bi ser xwe de dike. Birayê xwe Kerro û du heb jî hevalên xwe digihîne xwe li ser piştê hespa xwe Sûsikê siwar dibe û dertê sefera ser xalên xwe. Kulik bi serê xwe digre ser malên Gêsiyan û Herbozê ji wê derê dide dû xwe tîne. Pişt re diçe zîn û zengûyê wê tîne. Heft xalên Kulik radibin listikek tînin serê wî. Dibejin heke em bikaribin berê hespê Kulik bizivîrin ber bi erqê em ê karibin wî bikujin. Wusa dikin û li ber erqê Sûsik ji çokan de dikeve erdê. Xal li wê derê digrin ser xwarzê xwe Kulik û dikujin. Birayê wî Kerro û hevalên wî termê wî tînin nav êla xwe li wê binax dikin. Herbozê dibin ber derê Emer Axa datînin Şemsê li Kerro mar dikin.

3.1.5. Destana Binefşa Narîn

Destana Binefşa Narîn an li gor hinek guhertoyan destana Binefş û Cemîl Beg di nav kurdan de li hinek herêman tê zanîn. Di berhema ku Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl (2021: 15-36) berhevkarîya wê kirine de guhertoyek vê destanê cih digire û ev guherto

li Ermenîstanê ji zarê Hovsêpyan Hovnanêsi hatiye girtin. Ev guherto ji bo xebata me esas hatiye girtin. Ji derveyî vê guhertoyê, di berhema ku Heciyê Cindî (2016: 65-87) berhevkarîya wê kiriye de jî guhertoyek vê destanê heye. Ji bîlî vanan di gelek kilamên dengbêjiyê de evîna Cembelî û Binefşa Narîn cih girtiye.

Kurteya Destana Binefşa Narîn

Derwêş Axa pêşengê êleke mezin e. Bi darê zorê dixwaze Binefşa Narîn bîne ji xwe re. Binefşa Narîn vê daxwaza Derwêş Axa napejirîne û ji bo ku ji xişma Derwêş Axa birevin konê xwe bar dîkin navêla Cemîl Begê kurê Mîrê Hekariyan. Rojekê Beg dibîne ku li ser axa wî konek hatiye vegirtin. Tê dikeve kon, dipirse ev konê kê ye. Binefş radibe bûyera ku di serê wan de derbas bûyî ji Cemîl Begê re dibêje. Cemîl Beg diçe bi bav û birayê Binefşê re li hember Derwêş Axa dikeve şer. Di şer de bavê Binefşê tê kuştin lê bi alîkarîya Cemîl Beg, birayên Binefşê rizgar dibin. Ev bira bi Binefşa xwîşka xwe re dişêwirin û xwîşka xwe didin Cemîl Begê. Cemîl Beg bo zewacê roj datîne û vedigere navêla xwe. Dema roja wî tê, ji dayikekê dibihîze ku Derwêş Axa havêtiye ser konê Binefşa Narîn û wê ji xwe re biriye. Cemîl Beg gûstîla xwe dide wê dayikê û dişîne mala Derwêş Begê. Cemîl Beg xeberê bi dayikê rê dişîne cem Binefşa Narîn. Dibêje bila Cemîl Beg kurê Mîrê Hekariyan weke şivanekî bigirin xizmeta xwe. Piştî ku Binefş gûstîla bi dayikê re dibîne fêr dike ku ev kes Cemîl Beg bixwe ye. Radibin Cemîl Beg wek şivan digirin cem xwe. Li gor edetên wê êlê piştî heft salan Binefş diçe bêriyê û li bêriyê hevdu dibînin. Binefş radibe cilên Cemîl Beg ku şivanê wan e dipincirîne û bo başkirina wî ji Derwêş Beg dixwaze ku wî bîne malê. Cemîl Beg û Binefşa Narîn wê demê rastiye ji Derwêş Beg re dibêjin û Derwêş Beg jî ji bo kirinên xwe, xwe bi wan dide efûkirinê. Ê bi vî qeydê Cemîl Beg û Binefşa Narîn digihîjin mirazê xwe.

3.1.6. Destana Sêva Heciya

Destana Sêva Heciya ji hêla cureya xwe de dikeve nav destanên evîniyê. Wek Sêva Hecî, Sêva Heciyan, Sêva Mîran guhertoyên vê destanê hene. Ji bo vê xebatê guhertoya di berhema Heciyê Cindî (2016: 87-97) de esas hatiye girtin. Ji hêla mînakên motîfa îmtihanê de destanek dewlemend e. Weke destana Memê Alan di destpêka vê destanê de jî motîfa xewnê heye.

Kurteya Destana Sêva Heciya

Mîr Mehmûd kurê mîrê Beraza ye. Şevêk di xewna xwe de dibîne ku ew û Sêva Heciya bi hevdu gûstîlan diguherînin. Dema şiyar dibe çîroka xewna xwe ji bavê xwe re dibêje û dikeve dû Sêva Heciya. Ji ku derê dipirse kes nizane cihê wê nîşanî Mîr Mehmûd bide. Lê di rê de rastî birek pez tê. Bi şivan re diaxive. Şivan jî dildarê Sêva Heciya ye. Behsa xweşikiya wê ji Mîr Mehmûd re dike û rêya mala wê nîşanî wî dide. Mîr Mehmûd diçe heya ber derê konê Sêva Heciya. Dibîne ku li ber derê konê wan, mirov bi dor dikevin hundirê kon û derdikevin. Ji derdor dipirse ka ev çi kar e. Ji Mîr re dibêjin ku yên dikevin hundirê kon kîsê perê xwe didin û carek li Sêva Heciya temaşe dikin. Mîr Mehmûd jî çi pereyekî li cem wî nîne. Radibe li nêzî kon kilamekê distrê. Dema deng diçe Sêva Heciya, li cariyên emir dike dibêje xwediyê vî dengê bînin hundir. Dema Mîr Mehmûd tînin hûndirê kon Sêva Heciya wî nas dike û herdu digihîjin mirazê xwe.

3.1.7. Destana Zembîlfiroş

Di derheqa cihê bûyerên di vê destanê de qewimî de agahiyeke rast nîne li ber dest. Di bin sîwana edebiyata klasîk de, Feqiyê Teyran (z.1590, m.1660), Mûradxanê Bayezidî (z.1737, m.1794) û Melayê Bateyî (z.1675, m.1760) li ser vê destanê mesnewî nivîsîne. Ji bo xebata xwe, me guhertoya Mûradxanê Bayezidî (Samur, 2012: 123-143). esas girtiye.

Kurteya Destana Zembîlfiroş

Zembîlfiroş şehzadeyek kurê mîran e. Di jiyaneke xweş de dijî. Lê şevêkê di xewa xwe de dibîne ku yek jê dixwazê dev ji seltenetê û ji vê jiyana xwe berde û bibe derwêş. Zembîlfiroş ji xewê şiyar dibe xewna xwe ji jina xwe re dibêje û dibêje em ê bi ya xewna min bikin û dev ji her tiştî berdin, ji vî welatê koç bikin. Jina wî bi girî diçe vê daxwaza Zembîlfiroş bi mîr re parve dike. Mîr dibêje heke tu dev ji vê jiyaneke berdî ez ê te ji tevahiya mîrasê xwe bêpar bihêlim. Dewrêş qebûl dike û ji bajarê xwe koç dike. Li Mêrdînê koxikeke biçûk dibîne û malbata xwe tê de bicih dike. Li wê derê j xwe re dest bi karê firotina zembîlfiroşiyê dike û pê debara mala xwe dike. Rojek ji rojan dîsa di sûkê de dema zembîlên xwe difiroşe xatûna jina wî bajarî bang li wî dike. Zembîlfiroş diçe qesrê lê niyeta xatûnê ne ew e ku ji şehzade zembîlan bistîne. Wê çav berî çelengiya Zembîlfiroş daye. Ji Zembîlfiroş dixwaze ku dev ji zembîlfiroşiyê berde û

werê pê re bizewice. Lê Zembîlfiroş dibêje xwedî jin û zarok im û nikarim xiyanetê ji mîr re bikim. Lê çi dike ji defîka xatûnê xwe xilas nake. Dawiyê de dibîne ku ji destê xatûnê xilasî nîne xwe ji dîwarê kelehê de berî jêrê dide. Lê li hewa Cebrail wî digre û bêyî ku zirarek bigihîje wî, wî datine xware. Mîr bêyî haya wî ji bûyera di nava Zembîlfiroş û Xatûnê de hebe radibe Zenbîlfiroş bi malbata wî re li nik qesra xwe di qesreke mezin de bicih dike. Şevê Xatûn tê jina Zembîlfiroş di malê de girê dide û dikeve nav cihên Zembîlfiroş. Zembîlfiroş ku ji vê haydar dibe radibe bi malbata xwe re dîsa diçe warê xwe. Li warê xwe rasti jiyanê xweş tê û xewna ku dîtî bi tevahî derdikeve rastiye.

3.1.8. Destana Kela Dimdimê

Destana Kela Dimdimê tekane destana Kurdî ye ku tê de ji serî heya binî tema û hewayeke netewî heye. Ev destan ji aliyê gelek kesan de derbasî nivîsê bûye û bi vî awayî di nav kurdan de belav bûye. Erebê Şemo, Jan Dost li ser Kela Dimdimê pirtûk nivîsîne. Ev destan di nav kurdan de wek “Dimdim, Dimdim Xanê Kurda, Beyta Xanê Kurda, Xanê Lepzêrîn, Xanê Çengzêrîn, Xanê Destzêrîn, Kela Dimdim û Emerê Celalî jî tê binavkirin û gotin (Keskin, 2019: 189). Di destanê de mijar şerê kurdên Rojhilat li hember şahiya Îranê ye. Kelecana netewî ku ji vê destanê belav bûye di nav kilamên dawetan de jî cih girtiye. Lêkolîner û berhevkar Wasfî Ak di berhema xwe (2019: 62-64) de cih daye çend ji van kilaman. Di nav guhertoyên destanê de ji bo vê xebatê, guhertoya ku Wasfî Ak ji stranbêj Evdîlqadir Kizilkaya û stranbêj Evdîlah Ceyhan bihîstiye cih girtiye (Ak, 2019: 43-61). Ji bo motîfa îmtihanê di destanê de zêde mînak cih nagirin. Lê jimara wan kêr be jî di destanê de mînakên motîfên îmtihanê hatine tesbîtkirin.

Kurteya Destana Kela Dimdimê

Xano piştî ku di nav eşîra xwe de bi hinekan re xwînî dibe, radibe terka eşîra xwe dike û diçe xwe dispêre şahê Îranê. Rewşa xwe bi Şah re parve dike û jê daxwaza karek dike. Şah, xweşa wî ji Xano re tê û di qesra xwe de karek dide wî. Xano bi lawê xwe Evdal Xan re çend salan di xizmeta Şah de dimîne. Rojekê li gundekî di nav sînorên desthilatdariya Şah de şêrek êrîşî gundiyan dike û wan bêzar dike. Şah jî radibe û Xano bi ser wî şêrî de dişîne. Xano, şêr têk dibe lê destek xwe wenda dike. Dema tîcî Şah, Şah radibe destek zêrîn jê re çêdike û bi şûna destê wî ve dike. Xano dû demekê ji Şah,

bo tê de bihewe cihek daxawaz dike. Şah jî radibe wî cihê dide Xano. Di binê vî cihê ku Xano ji şah stendiye gencîneyek heye. Xano radibe bi malbata xwe re li ser vê gencîneyê kelehê mezin ava dike û navê Kela Dimdimê lê dike. Tevahiya hostayên ku haya wan surên vê kelehê çêbûne dikuje. Lê bi navê Mehmûtkê Alîkanî qewraşek dihêle. Xano ji derdoran, ji nav eşîrên kurdan leşkeran berhev dike û dest bi amadehiya şerekî mezin dike bi şahê Îranê re. Şah ji niyeta Xano haydar dibe û li dor keleha wî leşkeran berhev dike. Dawiyê de şerek mezin dest pê dike. Dema ku ji nav kelê Mehmûtkê Alîkanî bawerî bi têkçûna kelehê tîne bi Xano re qelaşiyê dike û cihê çavkaniya avê bi şah re parve dike. Şah radibe heywanan li ser wê ava kelehê serjê dike, wan ji hêzê de dixîne û têk dibe. Dawiya dawiyê dayika Xano di kelehê de agir berî barûdê dide û li dû xwe ji Kela Dimdimê çî sopekê nahêle.

3.2. DÎ DESTANÊN KURDÎ DE MÎNAKÊN MOTÎFÊN ÎMTIHANÊ

Di bin vî serenavî de ewilî ez ê derbarê motîfê de hinek agahiyan bidim û li gor cureyê mînakên van motîfan, motîfên ku di destanên Kurdî de cih girtine nîşan bidim. Di MIFLê de motîfên îmtihanê wek, îmtihanên nasnameyê, îmtihanên rastiye, îmtihanên zewacê, îmtihanên jîrekiyê, îmtihanên qabiliyetê û îmtihanên dinê di 6 beşan de li hev hatine dabeşkirin.

3.2.1. H.0. – H.199. Îmtihanên Nasnameyê: Naskirin

3.2.1.1. H.11. Naskirin Bi Vegotina Çîroka Jiyanê

Di vebêjeyan de leheng demekê ji hev dûr dikevin an jî di hevdişîna xwe ya ewil de ji hev re behsa çîroka xwe dikin. Ji derveyî serlehengan, lehengên alîkar jî caran vê rolê digrin ser xwe. Di destanên Kurdî de zêdetir wek epîzotek leheng, weke ku di destana Memê Alan de derbas dibe piştî xewnekê li dû hezkiriya xwe derdikevin ser rê. Di rê de rastî hinek astengan tên. Dema evîndar digihîjin hevdu çîrokên jiyanê xwe û serpêhatiyên xwe bi hev re parve dikin. Di hinek mînakên din de jî li rû evîndaran hinek alîkar peyda dibin. Ev alîkar dema ji evîndaran xeberan digihînin aliyê din, di rê de geşedanên di serê wan de derbasbûyî bi evîndaran re parve dikin. Ev mînak weke motîfa bi vegotina çîroka jiyanê naskirin, di xebata Thompson de cih digire. Di destanên Kurdî de ev motîf wuha derdikeve pêş me:

Cariye dema ji cem Mem vedigere mala Zînê tiştê di serî de derbas bûyî ji Zînê re

dibêje. (DMA)

Mem çîroka rêwitiya xwe bi Hesên re parve dike. (DMA)

Mem çîroka hatina xwe ya koşka jinan ji mîr re dibêje. (DMA)

Qîza Bekoyê Şeytan tiştên ku bi çavê xwe dîtine û bi guhê xwe bihîstine bi Zînê re parve dike. (DMA)

Şivan çîroka xwe bi Mîr Mehmûd re parve dike. (DSH)

Binefşa Narîn, çîroka xwe û birayên xwe bi Cemîl Beg re parve dike. (DBN)

Cemîl Beg, tiştên di serî de derbas bûne ji pîrê re dibêje. (DBN)

Zembîlfiroş tiştên ku xewna xwe de dîtî bi jina xwe re parve dike. (DZ)

Silêmin ji bo çi ji êla xwe qetiye yek bi yek bi serokê êlê re parve dike. (DKK)

Siyabend merama dilê xwe ji Qedê re dibêje. (DSX)

Pîrê ji sedema çi li Hesên Axa nifiran dike wek çîrok ji Siyabend re dibêje. (DSX)

Tirk û gêsan çi anîbin serê kalo yek bi yek ji Derwêş re dibêje. (DDE)

Xano bûyerên di serî de derbas bûyî yeko yek ji Şah re dibêje. (DKD)

3.2.1.2. H24. Ji Xewnê Naskirin

Ji Yewnana Kevn bigire heya niha gelek kes li ser wate û fonksiyonên xewnan rawestiyane. Ji Yewnana Kevn, Sokrates (Kaya, 2021: 451), xewnan weke “dengê ûjdanê” bi nav dike û bi ya wî divê kesên ku xewnan dibîne “li gor vî dengê ûjdanê tevbigere”. Di nav rê û rêbazên hevîrskirina lehengan de rêyeke herî berbelav ji xewn in. Leheng bi awayekî balkêş cara ewil hevdu di xewnan de nas dikin. Xewn, di vir de mesafeya fîzîkî ya di navbera evîndaran de ji holê radike. Dû dîtina xewnê evîndar guh didin dilê xwe û dikevin dû şopa hev. Ew êdî ne yên berê ne. Xewn vê gera di nav evîndaran de li wan ferz dike. Di vebêjeyan de bi evîndar re parvekirina xewnê rêyeke hevîrskirinê ye. Di dilê leheng de hezkiriyek heye, ew hezkirî xwe di xewnê de nîşanî hezkiriyê daye û ji bo pêşxistina têkiliyê divê evîndar ji warê xwe derkeve û bi awayekî xwe bigihîne evîndara xwe. Di destanên Kurdî de wek motîf xewn, di gelek cihan de derbas dibe lê li gor tesbîtên me, tenê di Destana Sêva Heciya de di nav hezkiriyên de xewn di rola hevîrskirinê de derbas dibe.

Dema Mîr Mehmûd behsa xewna xwe dike Sêva Heciya wî nas dike. (DSH)

3.2.1.3. H50. Bi Rêya Nîşaneyên Laşî an Têvgerên Fîzîkî Naskirin

Leheng bi hinek tevger an nîşaneyên xwe yê laşî ji yê derdora xwe dineqin. Ev taybetiyên kesayetî di hinek cihan de ji bo naskirina van lehengan dibin nîşane. Di destana Kerr û Kulik de motîfeke bi vî awayî heye.

Xalê Kerr û Kulik ji tevgerên wan tê derdixe ku ew ne cerd in lê Kerr û Kulik in hatine wê derê. (DKK)

3.2.1.4. H79. Bi Rêya Deng Naskirin

Weke taybetiyek kesayetî deng, ji bo lehengan dibe nîşaneya hev naskirinê. Leheng bixwe an weke alîkarek li rû leheng hesp, ji aliyê leheng de bi dengê xwe tê naskirinê. Naskirina bi rêya deng weke motîfek, di destanên Kurdî de di sê cihan de derbas dibe.

Mem ji Zîna ku nû ji xewê şiyar bûyî re dibêje, bang bike li cariyeyan heke bên li êlma te ev der qonaxa te ye, neyên ya min e. (DMA)

Mîr Mehmûd miqabilê konê Sêva Heciya disekine û deng lê dike. Sêva Heciya xwediyê vî dengê vedixwîne ber konê xwe. (DSH)

Dewrêş Axa ji dengê hespê tê derdixe ku ev hespek çê ye. (DBN)

3.2.1.5. H81. Naskirin Bi Rêya Tiştên Di Xewnê De Ji Leheng Stendî

Di vebêjeyên gel de xewn car caran wek motîf derdikeve pêşberî me. Li gor wateya ku Thompson li ser bêjeya motîfê barkirî helbet em nikarin tevahiya xewnên di van vebêjeyan de wek motîf bibînin. Lê em dikarin wan xewnên ku di vebêjeyan de li ser herikîna bûyerê xwedî bandor in wek motîf bibînin. Di destana Gilgamêşî de xewnên Gilgêşê û dîsa di destana Odesayê de xewna Agamemnon wek motîfa xewnê dikare bêne dîtinê. Di destanên Kurdî de motîfa xewnê di rola naskirina lehengan de tenê di destana Memê Alan de derdikeve pêş me.

Mem ji gustîla pêçiya xwe bawer dike ku ya şeva borî dîtî ne xewn e. (DMA)

3.2.1.6. H82. Naskirina Bi Rêya Nîşaneyên Zewacê

Di vebêjeyên gel de evîndar piştî ji hevdu vediqetin ji bo hevdu nas bikin ji hev hinek xelatan digirin. Ev xelat ji bo hevnaskirinê, di hevdîtina ewil ya evîndaran de derdikevin pêş me. Ev nîşane bi piranî wek gustîl, desmal, xencer an jî wek şûr derdikevin pêş me.

Binefşa Narîn ji gustîla paşila pîrê ketî têderdixe ku gustîl ji cem Cemîl Beg hatiye şandin. (DBN)

Zembîlfiroş ji xalxala di piyê jina di nav cihan de tê derdixe ku ya di cihê wî de ne jina wî ye lê Xatûna jina mîr e. (DZ)

Binefşa Narîn ji xencera destê şivên tê derdixe ku ya Cemîl Begê ye. (DBN)
Dema pîrê gustîlê nîşanê Xecê dide, Xecê jê bawer dike ku ji cem Siyabend hatiye. (DSX)

3.2.1.7. H86. Naskirina Bi Rêya Gustîla Nav Li Serê Nivîsî

Wek nîşaneya dergistîbûnê gustîl, xwedî wateyek kûr e. Li gor Yaprakê (2017: 710) gustîl, çend peyamên veşartî dihewîne di hundirê xwe de. Ji hêla şiklê xwe de giloveriya gustîlê jiyanê, demê û gerdûnê ku destpêk û dawîya wan nîn e temsîl dike. Dîsa li gor Eliade (1992: XIX), ‘îmge, remz û efsane afirandinên nemesûl yê derûnnasiyê nîn in’. Di vebêjeyên Kurdî de gelek cihan de wek nîşaneya hevnasînê gustîl derbas dibe. Lê mînaka gustîla li serê navê evîndaran nivîsandî tenê di destana Memê Alan de cih digire.

Zînê piştî ku navê “Memê Alan Padişahê Kurdan” li ser gustîlê dixwîne bi rastiya bûyera şeva borî baweriya xwe tîne. (DMA)

3.2.1.8. H172. Ajal Tenê Xizmeta Yekî Dike

Weke di vebêjeyan de derdikeve pêş me leheng, li ser rêya gihîştina mirazan de li pêş xwe astengan dibîne. Di derbas kirina van astengan de leheng, hewcehî bi hinek alîkaran dibîne. Ji mirovan, ji ajalan ev alîkar li rû leheng peyda dibin. Di nav van ajalên alîkar de di destanên Kurdî de ya ku herî zêde derdikeve pêş me hesp e. Hesp jî weke siwarê xwe xwedî hinek taybetîyan e. Bi tevgerên xwe, bi dengên xwe, bi mezinî, bi

sivikî û bêmînakiya xwe ji hemtayên xwe diqetin. Weke motîfa alîkariyê hesp, tenê di xizmeta siwarê xwe de ango tenê di xizmeta leheng de ye. Ev sadiqbûna hespê ya ji leheng re wek motîf di xebata Stith Thompson de cih girtiye. Di vê mînakê de hesp xizmetê tenê ji siwarê xwe re dike. Di destana Memê Alan de motîfeke bi vî awayî heye.

Hesen ji Mem re dibêje Bozê Rewan ji bilî te nahêle kesek ber pê here. (DMA)

3.2.2. H200. – H299. Îmtihanên Rastiyê

3.2.2.1. H217. Zava Dû Şerê Yek Bi Yek Wê Diyar Bibe

Keçika ku leheng li dû ye bi xweşikiya xwe xwedî nav û deng e. Ji ber vê xweşikiya keçikê li hember leheng gelek rakîb peyda dibin. Keçik li pêş hezkiriyên xwe hinek şertan datîne. Kesê ku vê keçikê bibe divê van şertan pêk bîne. Di vê motîfê de şert, gulaşa di nav evîndaran de ye. Kesê ku keçikê di gulaşê de têk dibe bi keçikê re dizewice. Di destana Kerr û Kulik de Werdek tevahiya xwezgîniyên xwe red dike. Di dawiyê de li pêş evîndarên xwe şertê gulaşa bi xwe re datîne. Tenê di destana Kerr û Kulik de ev motîf derdikeve pêş me.

Silêmin dema di şerê yek bi yek de piştê Werdekê datîne erdê, Werdek daxwaza wî ya zewacê qebûl dike. (DKK)

3.2.3. H300. – H499. Îmtihanên Zewacê

3.2.3.1. H310. Îmtihanên Xwezgîniyê

Di vê motîfê de şertên zewacê ji aliyê malbata bûkê de têne danîn. Yên ku tên ber derê keçikê divê van şertan pêk bînin.

Birayên Werdekê dibêjin, heke Silêmin karibe piştê xûşka me bide erdê em ê xûşka xwe bidin wî. (DKK)

Kesê bi Edûlê re bizewice divê di şerê li hember tirk û gêsan de bi ser bikeve. (DDE)

Kulik ji bo bi Şemsê re bizewice divê ji nav eşîra Gêsiyan hespa Elî Îsan ya bi navê Herbozê bîne ji bavê Şemsê re. (DKK)

3.2.3.2. H314. Îmtihankirina Jidiliya Xwezgînî

Xwezgînî di doza xwe ya gihîştina mirazan de çiqas jidil e, di vê oxirê de sebirdar e an na, ji bo bi asta jidiliya xwezgînî têbigihîjin wî bi hinek îmtihan re rûbirû dihêlin. Ev îmtihan bi piranî weke îmtihana sebrê derdikeve pêş me. Xwezgînî ji bo bigihîje mirazê xwe divê sebir bike. Weke ku di gotineke pêşiyên kurdan de derbas dibe *xwediyê sebrê wê bibe mîrê Misrê*. Di destanên kurdan de ev motîf di du cihan de derdikeve pêş me.

Cemîl Beg bo dîtina Binefşa Narîn 7 salan şivantiyê dike. (DBN)

Sêva Heciya qewl bi şivên re datîne heke Mîr Mehmûd 7 salan neyê wê Sêva

Heciya bi wî re bizewice. (DSH)

3.2.3.3. H326. Îmtihana Xwezgînî Bi Rêya Hunera Nêçîrê

Mirov dikare wek mijûlî û pişeyek dîroka destpêka nêçîrvaniyê heta destpêka mirovahiyê bibe. Li hember xetereyên ajalên di xwezayê de mirov, xwe bi rêya nêçîrvaniyê parastine û dîsa bi rêya nêçîrvaniyê debara xwe kirine. Piştî ku di serdema Neolîtîk de di navbera mîr û jinan de karên di jiyana wan ya rojane de li gor zayendê li hev tîr dabeşkirin, nêçîrvanî bi piranî para mirovên mîr dikeve.

Di nav karên navbera jin û mêran de dihat dabeşkirin de jin bi piranî bi karên zewiyê re mijûl dibûn, zed dihêrandin û dipijandin, hiriyê dirêstin, dîzik û xilikan çêdikirin, amûrên xemlê diafirandin, xwarinan çêdikirin û li telbê zarokan dikirin. Mîr jî li zewiyê dinihêrtin, şavî û çirpiyan paqij dikirin, xaniyan ava dikirin, ajalan xwedî dikirin û bi karên wan re mijûl dibûn, nêçîrê dikirin û hacetan çêdikirin (Oytan, 2021:995).

Weke di vir de jî em dibînin ji demên berê de di dabeşkirina karan de nêçîrvanî para mêran ketiye. Di vebêjeyan de nêçîrvanî bi piranî ji bo lehengên mîr nîşaneyek ji nîşaneyên jêhatîbûn û kêrhatîbûna lehangana hatiye dîtin. Di ev cure motîfê de xwezgînî ji bo gihîştina mirazê xwe li pêş xwe wek îmtihanek nêçîrê dibîne. Leheng divê wek astengek li pêş xwe jî vê îmtihanê derbas bibe. Di destanên Kurdî de ev cure îmtihan di du cihan de derdikeve pêşiya me.

Kulik li ser rê divê nêçîra karxezalê bike. (DKK)

Siyabend divê bide dû gakûviyê wê nêçîr bike û gurçikê wê bîne ji Xecê re. (DSX)

3.2.3.4. H331. Îmtihana Gulaşa Xwezgînî, Bi Bûkê Re

Di vê mînakê de di rola xwezgînî de leheng, divê li gor xwesteka birayên bûkê bi bûkê re gulaşê bike û wê têk bibe da ku bigihîje mirazê xwe. Ji bo vê mînakê tenê di destana Kerr û Kulik de mînakek ji vê îmtihanê heye.

Silêmin bo bigihîje mirazê xwe divê di gulaşê de Werdekê têk bibe. (DKK)

3.2.3.5. H331. Îmtihana Xwezgînî: Serkeftina Di Şer De

Xwezgînî dema ber bi hezkiriya xwe derdikeve ser rê li pêş malbata hezkiriya xwe hinek neyaran dibîne. Ji bo keçik di xweşikiya xwe de bêmînak e û ji bo ku xwezgînî bigihîje mirazan, rêya mirinê jî dide pêş çavê xwe, neyarên li pêş malbata hezkiriya xwe wek neyarên xwe dizane û bi wan re dikeve şer. Aqûbeta mirazê leheng bi encama şer ve girêdayî ye. Di destanên Kurdî de ev motîf di gelek cihan de derdikeve pêşiya me.

Cemîl Beg bi birayê Binefşa Narîn re li hember Derwêş Axa tevî şer dibe û hêzên wî têk dibe. (DBN)

Siyabend, Hesên Axa û hêzên wî ji holê radike. (DSX)

Derwêş ji bo bigihîje mirazan divê hêzên tirk û gêsên têk bibe. (DDE)

3.2.3.6. H335. Bûk Alîkariya Xwezgînî Dikin

Di vebêjeyan de leheng hinek astengan bi alîkariya hezkiriya xwe ji holê radikin. Ji bo ev cure motîfê tenê di destana Binefşa Narîn de mînakek heye.

Binefşa Narîn ji bo Cemîl Beg xwe bigihîne wê, Derwêş Axa razî dike. (DBN)

3.2.3.7. H.335. Erka Xwezgînî: Têkbirina Rakîbê Xwezgînî

Xwezgînî, bi gotineke din evîndar, dema evîna di dilê xwe didin der, li hember xwe, li ser rêya xwe hinek rakîban dibînin. Bi gelemperî mînakên evîndariyê yên di destanên Kurdî de derdikevin pêşiya me evînen yekalî nînin. Lê ji ber çînen di nav evîndaran de, ji ber cudabûna baweriyên evîndaran, ji ber dûrbûna cih, hinek rakîben ku ji xwezgînî bêtir nêzikî yara xwezgînî ne derdikevin pêşiya me. Li gor diwarbûna rakîban, barê evîndaran jî bêtir giran dibe. Rakîb di çavê xwezgînî de mirovek xirab e û ji vê bonê divê ji pêşiya wî xwe bide alî. Xwezgînî di vir de an bi şer an jî bi rêya razîkirinê divê van rakîban ji pêşiya xwe derxe da ku bigihîje mirazê xwe. Di Mem û Zîna Xanî de û di guhertoya Roger Lescot de Beko di şîbhê striyek de di navbera du

gulan de dide der û rêya gihîştina mirazan li pêşiya evîndaran digire. Weke van mînanan di destanên Kurdî de ji van mînanan gelek motif derdikevin pêşiya me.

Mem ji bo bi Zînê re bizewice divê bi awayekî, xwezgîniyê Zînê, Çeko û birayên wî razî bike. (DMA)

Mîr Mehmûd ji bo dilê şivanê ku ji Sêva Heciya hez dike xweş bike xûşka xwe dide wî. (DSH)

Cemîl Beg ji bo xwe bigihîne Binefşa Narîn, Derwêş Axa razî dike û ji pêşiya xwe derdixe. (DBN)

Siyabend xwe digihîne Hesên Axa û serê wî dipekîne. (DSX)

3.2.3.8. H.362. Bûk Ji Nav Keçikên Di Cejnê De Tê Bijartin

Di destanên Kurdî de ji bo hevdişîna hezkiriyên çend rê hene. Ji vana yek, xwezgînî di dilê şivan an qewraşek de diçe bi salan di xizmeta bavê bûkê de dixebite. Rêyeke dinê, xwezgînî di cejnê an jî di dawetê de di nav girseya berhevbûyî de hezkirîya xwe dibîne. Bûk ji maleke bijare ye û rûyê wê veşartî ye. Di ev cure hevdişînê de keçik ji aliyê xwezgînî de ji nav keçikên berhevbûyî tê bijartin. Di Mem û Zîna Xanî de Mem û Zîn roja cejna Newrozê di merasima pîrozkirina cejnê de hevdu dibînin. Di destana Memê Alan, guhertoya Lescot de Mem, Zînê ji nav keçikên ku diçin ser kaniyê de dibijêre. Ji derveyî vê di destanên Kurdî de me motifêke bi vî awayî tesbît nekin.

Mem ji nav wan keçên di ber şivakê de derbas dibin de Zînê dibijêre. (DMA)

3.2.4. H.500. – H899. Îmtihanên Jîrekiyê

3.2.4.1. H509. Îmtihana Kêrhatîbûnê

Li cih û warek heke keçikeke bi nav û deng hebe bibe nebe wê talibên wê keçikên jî hebin. Di heman demê de li cihek heke miletek li benda xweserî û rizgariyê mabe divê di kesê ku wek xelasker derdikeve meydana de hinek huner peyda bibin. Ev leheng beriya ku xwe bi derdoran, bi yara xwe bidin qebûlkirinê divê van hunerên xwe nîşanî muxetebên xwe bidin da ku ji nava rakîban bineqin.

Birayên Werdekê ji Silêmin re dibêjin heke tu pezê tî bi bilûrê bibî ser avê û tî vegerîni em ê xûşka xwe bidin te. Silêmin vî şertê tîne cih. (DKK)

Xano bêyî alîkariyek ji kesek bigre ji bo gundiyan derxe rehetiyê ji bo daxwaza

Şah bîne cih bi serê xwe diçe şêr dikuje û cergên wî ji Şah re tîne. (DKD)

3.2.5. H900. – H1199. Îmtihanên Qabîliyetê

3.2.5.1. H910. Dana Erkan Wek Bersivek Ji Bo Pêşniyar

Li kêleka malbata bûkê, li rû mîr, hinek şêwirmend peyda dibin. Bi pêşniyarên van şêwirmend û endamên malbatê, bûk hinek erkan dispêre xwezgînî. Di destanên Kurdî de du cihan de ji bo vê motîfê mînak derdikevin pêş me.

Beko ji Mîr re pêşniyar dike, dibêje bi Memo re şetrencê bilîze û ku te wî têk bir bigre bavêje zindanê. (DMA)

Birayên Werdekê ji Silêman daxwaza bi bilûrê derbaskirina pezê tih dikin. (DKK)

3.2.5.2. H919. Bi Pêşniyara Qewraşê Xayîn Erkên Ku Têne Dayîn

Di destanan de û di gelemperiya vebêjeyan de lehengên bingeîn, ji ehlê qesran, bi gotineke din ji çîna bijare ne. Dursun (2018, 36), di derbarê çîna lehengên destanan de, “lehengên destanan bi gelemperî mirov in, mirovên ku taybetiyên yezdandan di kesayeta xwe de dicivînin an jî lehengên rêvebir in” dibêje. Ev taybetî di vebêjeyan de qesran, wek mekanê ku bûyer lê diqewimin derdixe pêş me. Dema ku leheng ji ehlê qesran bin, mekanê ku lê bûyer diqewimin bi gelemperî qesr bin wê demê lehengên di qesran de, di xizmeta mîr, mîrzade an keça mîr de ne jî wek lehengên alîkar di herikîna bûyeran de cih digirin. Qewraş ji van lehangên yek e. Qewraş bi gelemperî di rola lehengên neyînî de derdikeve pêş me. Ji bo leheng negihîjin mirazên xwe gotinan digihînin mîr, wek şêwirmendek, mîr bi kiryarên hezkirîyan didin hesandin. Çetin (2017: 146), derbarê lehengên neyînî de de, “lehengên neyînî ji bo civakê hewayeke neyînî, tirsna û bêhêvîtiyê belav dikin”, dibêje. Lehengên ku bi wêrekiya xwe, bi çakiya xwe û rastiya xwe derdikevin pêş me li hember xwe di rola fesadek de, di rola fêlbazek de qewraşek xayîn dibînin. Di vê mijarê de Cizîrî (2020: 160), “leheng çi qasî mîrxas be, xulam tirsonek in, leheng çi qasî bikêrhatî be, xulam ew qasî nekirkêr in, leheng çi qasî rastgo be, xulam ew qasî derewan dikin, xulam çi qasî xwedî bext be, xulam ew qasî bêbext in” dibêje. Di destanên Kurdî de ev cure leheng tenê di du cihan de derdikeve pêşiya me. Di destana Memê Alan de di rola qewraşê xayîn de li pêş navê

Beko, jixwe wek bernavkeke neyînî ‘şeytan’ bi kiryaren wî ve lihevhatî bi ber navê wî ve ye.

Di dema lîstika şetrencê de Bekoyê Şeytan ji Mîr daxwaza cih guhertinê ya bi

Memo re dike. (DMA)

Mehmûtkê Alekanî wek qewraşek xayîn yê di bin fermana Xano de, cihê

çavkaniya ava ku diherike kelehê ji şah re dibêje. Bi pêşniyara wî, leşkerên şah

xwîne dişînin ser bîrên avê yên kelehê. (DKD)

3.2.5.3. H945. Erkên Xwebexşî Têne Hildan

Pêşiyên kurdan ‘*dilê tirsonek singa gewr nabîne*’ gotine. Di vê gotinê de peyama wêrekiyê û di dawiya vê wêrekiyê de mizgîniya gihîştina mirazan tê dayîn. Di vebêjeyan de, di nav kadroya lehengan de serleheng, bi lehengiya xwe ji yên dinê têne neqandin. Yê ku çav berî keçika herî çê dide, yê ku ji bo gelekî dibe hêvî û barê azadiya gelekî hildide ser xwe dive xwe ji civaka xwe re isbat bike ku ew yek e û li derdor yê herî baş e. Di vê oxirê de caran, bi rizaya dilê xwe, xwe dikin binê hinek baran. Ev motîf mînakên van motîfan di bin serenavê xwe de dihevin. Di destanên Kurdî de, di çar cihan de ev cure motîf derdikeve pêş me. Ji vana sê heb erk di oxira gihîştina miraza evîna kesayetî de têne hildan, yek jî di oxira azadiya gelekî de ji aliyê leheng de xwebexşî tê hildan.

Mem bi daxwaza dilê xwe erka şerê bi tirk û gêsan re hildide ser xwe. (DMA)

Kerr û Kulik erka anîna hespê xalanan xwebexşî hildidin. (DKK)

Siyabend bi awayekî xwebexşî erka nêçîra gakûvî hildide ser xwe. (DSX)

Xano ji bo azadiya kurdan, li dijî şah, xwebexşî rêya şer dibijire. (DKD)

3.2.5.4. H971. Erkên Bi Alîkariya Pîrek Têne Cih

Mirovên pîr, xwedî tecrube ne. Di vebêjeyan de bi gelemperî di rola lehengên erênî de derdikevin pêş me. Di rakirina astengên di pêş gihîştina mirazan ya evîndaran de rêbertiyê ji evîndaran re dikin. Ev mirovên pîr an rêya rastiye nîşan didin, an jî di navbera hezkiriyên de name û diyariyan dibin û tînin. Di destanên Kurdî de ev cure motîf di gelek cihan de rastî me tê.

Kalek tê xewna Siyabend û ji bo serkeftina wî rê nîşanî wî dide. (DSX)

Huwêd Beg ji bo Derwêş bi ser bikeve rêya xelasiyê nîşanî wî dide. (DDE)

Pîrê cihê hespa Bilêcan ji Kulik re dibêje. (DKK)

Metê gustîlê ji Siyabend digire û dibe dide Xecê. (DSX)

Pîredayika Xano, piştî ku leşker ji Kela Dimdimê bidawî dibin, ji bo neyar kelê negrin, kelê bi tevahiya gencîne û cebirxaneyên tê de diteqîne. (DKD)

3.2.5.5. H976. Erk Ji Aliyê Lehengê Efsûnî Têne Cih

Di herikîna bûyeran de leheng caran di navbera xwe û yezdan de hewcehî bi navbeynkarek dibînin. Ev navbeynkar di navbera evd û afirîner de qasidiyê dikan. “Kesê pîroz çî carekê bi mirovên ji rêzê re têkiliyeke rasterast danaynin. Lewra di navbera kesên pîroz û kesên ji rêzê de hebûna têkiliyeke rasterast dibe ku statuyêke di destê yê ji rêzê de nîne bexşî mirovê ji rêzê bike” (Balkaya, 2015: 96). Di dîn de jî yezdan, di navbera xwe û evdên xwe de ji bo birina emr û fermanan qasidan tayîn kiriye. Di destan û vebêjeyan de kesên wek Cebraîl an Xoce Xidir/Xizir caran ji bo nîşandana rê derdikevin ser rêya lehengan an dikevin xewnên wan. Di vebêjeyan de roleke van mirovên pîroz jî navdanîna zarokan e. Ev erk ji aliyê van kesan de têne cih.

Xoce Xidir li Elî Begê, Emer Begê û Elmaz Begê xwe nîşan dide û mizgîniya lawekî dide wan. (DMA)

Zembîlfiroş dema xwe ji kelê de davêje xwarê Cebraîl li hewa bi cendekê wî digire û datîne erdê. (DZ)

3.2.5.6. H981. Erk Ji Aliyê Birayan De Têne Cih

Di vebêjeyan de dema erk têne diyarkirin li gor wê erkê jî lehengek tê bijartin. Hinek caran vebêjer radibe li rû van lehengan hinek alîkaran bicih dike. Ev alîkar di bicihanîna erkê de li kêleka leheng cih digirin û bi awayekî dilsozane heta dawiyê li rû leheng dimînin, bi leheng re radibin rûdinîn, bi leheng re tevlî cengê dibin yanê weke siya leheng çî carekê ji leheng naqetin. Ji van alîkaran hinek, ji birayên leheng pêk tên. Di destanên Kurdî de, di du destanan de ev motîf derdikeve pêşîya me.

Kerro tola Kulik ji xalan digire. (DKK)

Sahdûn heta hilma xwe ya dawiyê li rû birayê xwe Derwêş cengê dike. (DDE)

3.2.5.7. H982. Erka Bi Alîkariya Ajalan Tê Cih

Ajal di pêkanîna erkan de wek alîkarên sadiq li rû leheng cih girtine. Ji van ajalan di destanên Kurdî de ya herî zêde derdikeve pêş me hesp e. Hesp di rêwîtiya leheng de alîkariyê ji leheng re dike. Di piraniya destanên Kurdî de motîfa hespa alîkar derdikeve pêş me.

Bozê Rewan bêtî ku li cihek raweste an avê vexwe Mem digihîne bajarê Zînê,
Cizîrê. (DMA)

Kulik çavê hespa xwe Sosikê maçî kir li ser piştê wê ajot nava şer. (DKK)

Siyabend, Hêşînbozê Surê ji tewlê kişand, lê siwar bû û di demeke kurt de xwe
gihand etegê çiyayê Sîpanê. (DSX)

Derwêş li ser piştê hespa xwe Hedban dide nav koma tirk û gêsan. (DDE)

3.2.5.8. H.1020. Karên Li Dijî Zagonên Xwezayê

Ji bo her tiştî, her zîndewerî di pêkanîna hinek erkan de wek hêz şîyanek hatiye diyarkirin. Erkên di çarçoveya van şîyanan de cih digirin wek xwezaya van zîndeweran hatiye dîtin, yên derveyî vê çarçoveyê de jî dimînin wek karên li dijî xwezaya ajalan têne dîtin. Di mîtolojiya yewnanî de bi navê Pegasos hespeke bi perr heye. Ev hesp bi xêra perrên xwe difire û mesafeyan nêzik dike. Di destanên Kurdî de jî leheng û hespê leheng hinek erkên ji şîyanên xwe der tînin cih.

Mem li ser piştê Bozê Rewan bêtî ku li derekê rawestê, bêtî ku hespa xwe carek
av bide rêya şeş mehan derbas dike. (DMA)

Piştî ku Mem xwe piçek tevdide werîs dibe piç û parî. (DMA)

Mem bi pêta devê xwe pif dike zincîra piyê xwe, zincîr dihele û dikeve erdê.
(DMA)

Emer Beg Şêxê Qureyşîyan xwe davêjê nava agir û kurê Hesên sax û salim ji nav
agir derdixe. (DMA)

Mem di bin behrê de lêdike hîmê diwanzdeh odeyan. (DMA)

Destê Xano yê zêrîn biruh dibe. (DKD)

3.2.5.9. H.1023. Erkên Li Dijî Xwezaya Tiştan

Di destanan de leheng, mekan û bûyer bi gelemperî asayî bin jî caran mînakên derasayî jî derdikevin pêş me. Di bin vî serenavî de mînakên motîfên derasayî yên ku aidê lehengan in derdikevin pêş me.

Xencera Cemîl Beg şewqa xwe dide nav elba şîr, şîr di cih de diquse. (DBN)

Werdek bi hêsirên çavê xwe nameyek ji birayê xwe re dinivîse. (DKK)

Şah ji Xano re destek zêrîn çêdike û pê re ruh dikişe vî destê zêrîn. (DKD)

3.2.5.10. H.1024. Erkên Li Dijî Xwezaya Ajalan

Weke mirovan ajal jî di xwe de, di nijada xwe de hinek taybetiyên nijadî dihewînin. Tevgerên ji derveyî van taybetiyan dimînin wek erkên li dijî xwezaya van ajalan têne binavkirin. Erkên di şert û mercên asayî de ku bi alîkariya ajalan nayên cih di vir de têne cih. Ji aliyê ajalan de pêkanîna van erkan, kar û îmtihanên li pêş leheng hêsanîr dikin. Di destanên Kurdî de hesp, pez û teyr erkên bi vî awayî tînin cih.

Hespê Siyabend, selan ji erdê radike û wekî însanekî hêsiyan ji çavan dibarîne.

(DSX)

Bozê Rewan bêyî ku avê vexwe rêya şeş mehan derbas dike. (DMA)

Silêmin pezê tî ji avê derbas dike. (DKK)

Refên teyran ji jor de tî alîkariya Xanê Lepzêrîn. (DKD)

3.2.5.11. H.1090. Erkên Ku Bi Lezeke Derasayî Têne Cih

Li pêş leheng ji bo pêkanîna erkê demeke diyarkirî heye. Karên ku bi lezeke derasayî têne cih, rêyên ku di demeke derasayî de têne derbaskirin wek motîf têne binavkirin. Di destanên Kurdî de di lezeke derasayî de ji bo pêkanîna van erkan wek alîkar hesp, li rû leheng peyda dibe û vê erkê tîne cih.

Hespê kalo û Mem dajon rêya şeş mehan di nav panzdeh roj û şevan de. (DMA)

Siyabend riya heft rojan di rojekê de diqedîne. (DSX)

3.2.5.12. H.1155. Kedîkirina Ajalên Hov

Weke leheng, ajalên di xizmeta leheng de jî divê xwedî hêz û taybetiyeke derasayî bin. Ev derasayîbûn, weke kedîkirina ajalên hov wek motîf derdikeve pêş me. Di destana Memê Alan de Mem ji bo hilde xizmeta xwe hespeke avî kedî dike.

Memê Alan hespeke avî tîne û ji xwe re kedî dike. (DMA)

3.2.5.13. H.1161. Kuştina Ajalên Hov

Li ser rêya mirazan leheng, nêçira hinek ajalên hov dike. Hewla nêçîrkirina ajalên hov jî dibe wek nîşane ji hêza leheng re. Di destanên Kurdî de ev motîf di sê cihan de derdikeve pêş me.

Kulik karxezalekê nêçîr dike. (DKK)

Siyabend gakûviyê nêçîr dike. (DSX)

Xano şêr dikuje. (DKD)

3.2.5.14. H.1210. Erka Ji Aliyê Qrêl De Tê Dayîn

Di destanan de qrêl an kesê xwedî otorîte erkan dispêrin lehangên. Di pêş gihiştina mirazan de ev erk divê bîne cih da ku leheng di erkên xwe de bi ser bikevin. Di destanên Kurdî yek jê motîfa herî zêde derdikeve pêş me ev e. Di naverokên pênc destanan de ev cure motîf hatine tesbîtkirin.

Mem li seracan emir dike bo ku ji Bozê Rewan re taximekê çêbikin. (DMA)

Mem li Beglî emir dike bo jê re bîne Bozê Rewan e. (DMA)

Mem li kêleka bajêr li maleka ku lê dibe mêvan emir dike ku ji hatina wî ya wê derê kesî haydar neke. (DMA)

Mîr li civata kombûyî emir dike wek kesek qehweya li ser sêniyê bi ser xwe de neke û silava şerqîyan negirin. (DDE)

Mîr bo malbata Zembîlfiroş veguhezînin qesreka nik wî leşkerên xwe dişîne cem Zembîlfiroş. (DZ)

Mîr Mehmûd li şivan emir dike bo derkeve ji pêşiya wî Sêva Heciya. (DSH)

Şah ji Xano dixwaze ku biçe şêr bikuje û cergên wî ji wî re bîne. (DKD)

3.2.5.15. H.1215. Erka Piştî Ku Leheng Pesnê Xwe Dide Tê Dayîn

Gotineke berbelav heye di devê civakê de. Tê gotin ku dema gotin di devê mirov de ye di xizmeta mirov de ye lê dema ku gotin ji devê mirov derdikeve mirov dikeve xizmeta gotina xwe. Leheng di nava koma hevalan de, an di di civakê de pesnê xwe bi tiştê dide û piştî ku ev gotinên leheng digihîjin ber guhê mîr an keçikê ji layê wan de bo isbata van pesnan li xwezgînê erk tene spartin.

Derwêş li cem hevalan pesnê xwe dide, dibêje ez kilê çavê Edûlê me. Piştî ku Mîr bi vê dihesê vexwarin qehweya tel û herwiha şerê li hember gêsê û tirkan dispêre wî. (DDE)

Silêmin piştî ku ji Werdekê re pesnê xwe dide, Werdek gulaşê lê emir dike. (DKK)

3.2.5.16. H.1217. Piştî Dîtina Xewnê Erka Tê Dayîn

Tiştê leheng di xewna xwe de dîtî ji bo leheng di heman demê de wek erk tene dayîn. Leheng ji bo pêkanîna van erkan derdikeve seferê. Di sê destanên Kurdî de motîfên bi vî awayî hatine tesbît kirin.

Mîr Mehmûd piştî xewna xwe, derdikeve sefera Misrê. (DSH)

Zembîlfiroş piştî dîtina xewnê dikeve ser rêya koçê. (DZ)

Xano di xewna xwe de ewliyayek dibîne, ewliya jê re dibêje gencîneya te dîtî di oxira xelasiya ji destê zaliman de xerc bike. Xano li gor şîretên ewliyayê di xewa xwe de dîtî tevdigere. (DKD)

3.2.5.17. H.1217.1. Gera Li Dû Şîroveya Xewnê

Xewn, gera li dû şîroveya xewnê ji bo leheng dibe sedema gerînekê. Leheng ji bo şîroveya xewna xwe dikevin ser rê. Ne tenê di destanan de wek mînak di dengbêjiyê de jî motîfa xewnê heye. ‘‘Evdalê Zeynikê dû nexweşîneke dirêj xewnekê dibîne û dû vê xewna xwe dibe dengbêj’’ (Kardaş, 2017: 188). Ji derveyî vê di baweriyên semawî de jî xewn xwedî cihekî taybet e. ‘‘Di tekstên olî de, di destpêka olên semawî de, gelek çîrokên ku bi xewnek dest pê dikin û bi dû re dibin sebebê guhertinên dîroki hene’’ (Cizîrî, 2020: 162). Xewn, şîroveya xewnan di serdema nûjen de jî xwedî giringiyekê

ye. Di qada derûnnasiyê de ji bo qenckirina derûniya mirovan bi navê *bi rêbaza şîrovekirina xewnan eşkerekirina derûniya mirovan* rêbazek jî heye. Freud di rêbaza psîkanalîzmê de, derbarê xewnan de (Akot, 2010: 225), “xewn, ji zindîbûna paşerojê pêştir tiştek nîne” gotiye. Di destanana de jî weke motîfekê xewn, li ser herikîna bûyeran xwedî bandorekê ne. Di destana Sêva Heciya de motîfeke bi vî awayî hatiye tesbît kirin.

Mîr Mehmûd ji bo şîroveya xewna xwe li derdora dikeve lêgerînê. (DSH)

3.2.5.18. H.1220. Erkên Xwebexşî Têne Hildan

Leheng ji bo hêz û jidiliya xwe nîşanî civaka xwe bidin bi awayekî xwebexşî xwe didin binê hinek baran. Ev motîf wek erkên xwebexşî hatine hildan cih digire di xebata Thompson de. Di destanên ber destê me de, di sê cihan de ev motîf hatine tesbît kirin.

Mem çûna bajarê Cizîrê ji bo gihîştina mirazan xwebexşî hildide. (DMA)

Derwêş erka şerê li hember gêsan û tirkan xwebexşî hildide. (DDE)

Kulik erka anîna hespa Bilêcanê xwebexşî hildide. (DKK)

3.2.5.19. H.1233. Alîkar Di Pêkanîna Erkê De

Di destanan de dema leheng ji bo gihîştina mirazê xwe ber bi welatê hezkiriya xwe de biryara rêwîtiyekê dide qels e û bêhêz e. Hewcehiya derketina alîkarek ji vê derê derdikeve. Leheng hewcehiyê bi alîkarek dibîne. Balkaya, di herikîna buyerên di vebêjeyan de tevlibûna lehengên alîkar wek hemleyek di destê vebêjer de dibîne. Lewra dibêje, heke vebêje bes li dor lehengek bê sazîkirin hem di hêla mijarê de, hem di hêla honandina bûyerê de hem jî di hêla kadroya lehengan de sînorkirinek tîne (Balkaya, 2015: 37). Di derbarê peydabûna lehengên alîkar de Propp (1998: 39), dibêje “di çîrokan de leheng bêhêz e, bêtir ku zanibe diçe kuderê derdikeve ser rê. Lê di rê de li rû leheng alîkarek peyda dibe”. Di destanên Kurdî de di rola alîkaran de em bi piranî rastî jîneke pîr, mîrê pîr an jî di dewsa zîlamê pîroz de em rastî Xoce Xizir tînin. Lê alîkar bi vana naqedin. Di pêkanîna erkê de li dor leheng hespek peyda dibe. Thompson di xebata xwe de bi navê ajalên alîkar cih dabe serenavek jî di destanên Kurdî de em di rola ajalên alîkar de tenê rastî hespê tînin. Di navbera welatê leheng û welatê hezkiriya leheng de mesafeya heyî, di şerê hemberî malbata hezkiriya leheng de dîsa hesp hertim di alîkariya leheng de ye. Qedera leheng û hespa leheng ewqas zêde bi hevdu ve

girêdayiye ku di piraniya destanên Kurdî de heta hesp têk neçe têkçûnek ji leheng re nîne. Neyar dema bi vê têdigihîjin weke ku di destana Derwêşê Evdî de derbas dibe, ji bo Derwêş têk bibin berê hespê Derwêş didin bajarê mişkan an jî weke di destana Kerr û Kulik de derbas dibe berê hespê Kulik didin ava golgeniya. Da ku dû tunekirina hespê leheng, leheng jî tune bikin. Di bine vî serenavî de wek jina pîr, mêrê pîr, mêrê pîroz û hesp di rola motîfa alîkariyê de derdikevin pêş me.

3.2.5.20. H.1233.1. Jina Pîr

Piştî hevdîtina ewil, hezkirî ji hev dûr dikevin. Leheng ji bo birina xeberê ji mala hezkiriya xwe re hewcehî bi navbeynkarek dibînin. Ji bo ev navbeynkar karibe xwe bigihîne odeya keçikê divê jin be û xwe gihîştina cem bûkê de di hêla mehremiyetê de astengek tunebe li pêş. Di mijara jina alîkar de Balkaya (2015: 83), “vebêjeyan, nemaze jî vebêjeyên lehengiyê wek tekoşîna mêran dibîne. Di van vebêjeyan de honandina metnê weke ku ji jiyanîna mêran pêkhatibe dixwiye.” Nêrîn her çiqas bi vî awayî be jî di van metnan de jin jî di hinek cihan de wek nifteyek, wek lehengek alîkar cihê xwe digire. Ev jina pîr, di hinek cihan de bi şîretên xwe, di hinek cihan de jî bi rola xwe ya navbeynkariyê di navbera hezkiriyan de cih digire. Her çiqas di çarçoveya xebata me de cih negirtibe jî di destana Mem û Zîna Ehmedê Xanî de bi navê Heyzebûnê pîreke alîkar heye ku di navbera Mem û Zînê de navbeynkariyê dike.

Zînê weha gote Heyzebûnê:

“Min dil bûye werteyek ji xûnê (Xanî, 2019: 66).

Ji derveyî vê mînakê di destanên Kurdî de tenê di du cihan de ev motîf derdikeve pêşiya me.

Pîrê gustîla Siyabend digihîne Xecê. (DSX)

Dayê ji Xano dixwaze bo xebera alîkariyê bişîne ser eşîran da ku bîr li hewara wan. (DKD)

3.2.5.21. H.1233.2. Mêrê Pîr

Li ser rêya gihîştina mirazan, leheng alîkariyê ji mirovekî temen mezin dibîne. “Di vebêjeyan de bi gelemperî, kesekî ku rê nîşanî leheng dide, agahiyên ku hewcehiya leheng pê hene bi leheng re parve dike cih digire” (Balkaya, 2015: 70). Ji ber ku leheng

kesekî naşî ye û hewcehiya wî bi şîretên jiyanê hene li ser rêya wî pîrek derdikeve ser rêya wî û rê nîşanî wî dide. Di destanên Kurdî de, di du cihan de motîfek wuha rastî me tê.

Ticarê kal li Cizîrê rê nîşanî Mem dide. (DMA)

Huwêd Beg li qada şer alîkariya Derwêş dike. (DDE)

3.2.5.22. H.1233.3. Mêrê Pîroz

Mirov, xwedî hêzeke sînorkirî ne. Bi vê hêza xwe ya sînorkirî nikarin têkiliyeke rasterast bi yezdan re deynin û jê alîkariyê bixwazin. Di navbera evdan û mirovan de hinek alîkarên pîroz peyda dibin. Ev alîkar rasterast ji cem yezdan xeberan digihînin lehengan û leheng li gor şîroveyan ji cem yezdan gihîştine cem wan tevdigerin. Ev alîkar, di destanên Kurdî de wek Xoce Xidir, Kalê Xizir, Cebraîl an ewliyayek derdikevin pêş me.

Xoce Xidir, rê nîşanê Elî Begê Emer Begê û Elmaz Begê dide. (DMA)

Kalê Xizir alîkariya Mem dike û rê nîşanî wî dide. (DMA)

Cebraîl, Zembîlfiroş ji mirinê xilas dike. (DZ)

Ewliyayek di xewna Xano de rê nîşanî wî dide. Xano li gor şîretên ku ewliya li wî dike tevdigere û digihîje xelasiyê. (DKD)

3.2.5.23. H.1233.6. Wek Alîkar Hesp

Di serdema nûjen de ji bo rêwîtiya mirovan amûr û wesayîdên curbicur derketibin holê jî, di demên berê de hesp ji bo rêwîtiyê, ji bo cotkariyê alîkariyeke zêde dane mirovan. Ji ber ku vebêje jî ji serdemên berê gihîştine dema me, di van vebêjeyan de leheng, weke rêhevalek hertim hespek li rû xwe dîtine. Di destana Memê Alan de, destana Derwêşê Evdî û Kerr û Kulik de ev têkiliya xurt ya di navbera mirov û hespan de baştir derdikeve pêşiya me.

Bozê Rewan di pêkanîna erkên li pêş Mem de alîkariya wî dike. (DMA)

Hedban alîkariya Derwêş dike. (DDE)

Hêşinbozê Surê alîkariya Siyabend dike. (DSX)

Sosik alîkariya Kulik dike. (DKK)

Hespê Cemîl Begê di pêkanîna erkên li pêş wî de alîkariya wî dike. (DBN)

3.2.5.24. H.1236. Derbaskirina Rêya Xeternak Di Dema Erkê De

Berê jî me gotibû di vebêjeyan de wek epîzotek, rêwitiya leheng ya ber bi welatê hezkiriya wî cih digire. Li ser rêya vî lehengî hinek xetereyên xwezayî û mirovî hene. Leheng ji bo bigihîje mirazê xwe divê haya wî ji van xetereyan hebe. Di nav destanên ku me di xebata xwe de cih daye wan de di du cihan de motîfek wuha derdikeve pêş me.

Mem dema diçe Cizîrê li pêş wî çemê Dîcleyê heye, divê ji vî çemê xeternak derbas bibe. (DMA)

Kulik dema diçe şerê xalanan divê di rê de nehêle hespê wî Sûsik ji ava golgeniya vexwe. (DKK)

3.2.5.25. H.1301. Gera Li Dû Keybanûya Li Dûr

Di destanan de leheng an bi rêya xewnê an bi rêya behskirina derdoran, hay ji keybanûyeke xweşik ya li welatekî dûr çêdibe. Peydakirina vê keybanûyê, her wiha gihîştina vê keybanûyê dibe armanc, dibe miraz ji leheng re. Li gor vê motîfê tenê di destana Memê Alan de mînaekeke îmtihanê hatiye tesbît kirin.

Mem ji bo cihê keçika ku di xewna xwe de dîtiye peyda bike, dikevê gerê. (DMA)

3.2.5.26. H.1308. Gera Li Dû Hespa Herî Rind

Weke leheng, divê hespa leheng jî bêmînak be li derdoran. Li pêş leheng rêyeke, îmtihaneke diwar heye. Ji bo derbaskirina vê rêyê hewcehî bi alîkarek çê heye. Ev alîkar hesp e. Di mînakên motîfên binê vî serenavî de ev cure motîf cih digirin.

Memê Alan ji bo peydakirina hespa herî rind li devê behrê derdikeve gerê. (DMA)

Kerro û Kulik ji bo xwe bigihînin Bilêcanê derdikevin gerê. (DKK)

3.2.5.27. H.1381. Gera Li Dû Keçika Di Xewna Xwe De Dîtî

Leheng di xewna xwe de keçikekê dibîne û di hevdtîna ewil de dibe evîndarê wê keçikê. Ev keçik kî ye, ji ku derê ye leheng nizane. Ji bo dîtina cih û warên vê keçikê leheng derdikeve ser rê. Ev motîf di du destanan de hatiye tesbît kirin.

Mem ji bo xwediyê gustîla di tiliya xwe de bibîne dikeve gerê. (DMA)

Mîr Mehmûd ji bo peydakirina wê keçika ku ketî xewna wî derdikeve gerê.

(DSH)

3.2.5.28. H.1397. Gera Li Dû Neyaran

Di vebêjeyên gel de leheng li ser rêya gihîştina mirazan de li pêş xwe hinek rakîban dibînin. Ev rakîb di dewsa astengan de cih digirin. Leheng ji bo ji holê rakirina van rakîban derdikeve gerê.

Cemîl Beg ji bo ji holê rake dide dû neyarên malbata Binefşa Narîn. (DBN)

Derwêş ji bo şerê bi tirk û gêsan re dide dû wan. (DDE)

3.2.6. H.1400. – H.1599. Îmtihanên Dinê

3.2.6.1. H.1450. Îmtihana Baldariyê

Li ser rêya leheng hinek dafîk hatine danîn, lehengê ku haya wî ji bayê felekê nîne divê li hember van dafîkan baldar be da ku têk neçe. Di du destanên Kurdî de ev cure motîf peyda dibe.

Memê Alan li gor şîreta kalo divê li ber derê Cizîrê li dek û dolavên keça Beko baldar be. (DMA)

Kerro û Kulik divê li ser rêya şerê bi xalan re baldar bin ku Sûsik ji ava golgeniya venexwê. (DKK)

3.2.6.2. H.1500. Îmtihana Berxwedanê

Kuştina leheng divê bi erka ku hildaye piştî xwe re lihevhatî be. Mirin an dû şerê giran mana li jînê divê bi nav û dengê leheng ve lihevhatî be. Tekoşîn divê heya hilma dawiyê bidome da ku ev berxwedan weke motîfêkê bê dîtin. ‘‘Di edebiyata devkî de hemû leheng xwediyê hinek taybetmendiyan neqandî ne. Ev taybetmendî li gorî pêwendiyên gerdûnî û herêmî, li gorî dem û îdeolojiya serdest in’’ (Cizîrî, 2020: 154). Di nav van taybetiyan lehengan de berxwedan, taybetiyeke girîng e ku lehengan ji koma mirovên dorê dineqîne. Li hember êşan ber xwe dayîn, sebra li hember demê nîşaneyên vê berxwedana leheng in. Di destanên ber destê me de motîfeke bi vî awayî di sê cihan de hatiye tesbît kirin.

Kulik divê bi serê xwe, li hember tîrên xalanan ber xwe bide. (DKK)

Derwêşê Evdî di qada şer de heta dawîya hêza xwe ber xwe dide. (DDE)

Zembîlîroş ji bo ku xwe bigihîne jiyana paktir divê li hember dafîka ku Xatûnê daniye pêş wî ber xwe bide. (DZ)

3.2.6.3. H.1553. Îmtihana Sebrê

Xwediyê sebrê bûye mîrê Misrê gotine pêşiyên kurdan. Lehengê ku derdikeve ser vê rêyê divê xwediyê sebreke zêde be. Di oxira gihiştina mirazên xwe de divê hinek tiştan daqurtîne. Wek xizmeta bi salan ya li ber destê mîr, şivantiya bi salan û hwd.

Cemîl Begê ji bo xwe bigihîne Binefşa Narîn divê heft salan şivantiyê bike ji axê re. (DBN)

Xano ji bo ku cihek ji mîr bigire divê bi salan di xizmeta mîr de bimîne.

3.2.6.4. H.1558. Îmtihana Hevaltiyê

Her çiqas leheng xwedî hêzeke zêde bin jî, caran di hinek erkên dijwar de hewcehiyê bi hevalên sadiq dibînin. Dema leheng ji bo bigihîje mirazên xwe ji van lehengan sonda hevaltiyeke heta û hetayî digire. Piştî vê sondê qehweya li ser sêniyê bi ser xwe de dike an di mînakeke din de dest bi rêwîtiyeke dûv û dirêj dike. Ji ber ku li ev cure hevaltiyê wateyek taybet hatiye barkirin û di naveroka metnê de ji carekê bêtir caran dubare dike di dewsa motîfek de tê dîtin. Di hinek destanên Kurdî de ev cure motîf hatine peydakirin.

Memê Alan dema diçe Cizîrê, Hesên û birayên xwe jê re hevaltiyê dikan. (DMA)

Qedê heta dawîya jiyana xwe hevaltiyê ji Siyabend re dike. (DSX)

Sahdûn û hevalên xwe heta dawiyê ji Derwêş naqetin û li pişt wî şer dikan. (DDE)

Xanê Mukrî heta dawîya şer ji nik Xano xwe nade alî. (DKD)

Di destanên Kurdî de mînakên motîfên îmtihanê yên bi ber destê me ketin ji vana pêk tên. Ji bo xebata me tenê guhertoyên ku me wek guhertoyên eslî bijartine di vir de esas hatine girtin. Weke tê dîtin tevahiya serenavên mînakên motîfên îmtihanê di vê beşê de cih nagirin. Li gor MIFLê di destanên Kurdî de ji kîjan mînakan motîf hatibin tesbît kirin tenê ew beş, wek serenav cih girtine di vir de.

ENCAM

Tevahiya taybetiyên ku netewan ji hevdu diqetînin û wan wek netew didin nasîn di bin serenavê çandê de dicivin. Ev çand weke nivîskî û devkî vediqete du beşan. Gelên ku bi rêya nivîsê, bi rêya perwerdehiyek formal nikarin zimanê xwe, çanda xwe fêrî nîşên dû xwe bikin radibin ji çanda devkî sûdê werdigirin. Lê di vê heyama modernîzmê de êdî bi rêya devkî jî zêde tişt li ser bîra hevpar ya netewan nayê bar kirin. Di ser de destkeftiyên bi salan li ser vê bîrê hatine bar kirin û wek çand hatine bi nav kirin jî yek bi yek ji vê bîrê têne ji bîr kirin. Netew bi zimanên xwe ve êdî di oxira çandeke serdest de heyîniya xwe feda dikin û ji dika dîrokê xatirê xwe dixwazin. Ji bo pêşî lê girtina vê demajoyê hewcehî bi xebatên li ser folklorê netewan heye. Weke ku me di mînaka ekola finî de destnîşan kir, caran destanek belavbûyî jî dikare neteweyek ji ber mirinê rizgar bike. Ev qîmeteke zêdetir li ser xebatên folklorê bar dike.

Di binbeşa zanista folklorê de destan, mijara danasîna tevgerên netewan de roleke girîng dilîze. Di naveroka her destanê de motîfên biçûk biçûk cih digirin. Destan ji tevahiya van motîfan pêk hatine. Stith Thompson nêzikî serdemeke berê dest bi xebateke berfireh kiriye û di dawiyê de vê xebata xwe ya li ser motîfan li ser vê qadê zêde kiriye. Thompson, di berhema xwe ya Motif-Index of Folk-Literature yê de 23 cure motîf tesbît kirine. Ji van motîfan yek jî motîfa îmtihanê ye. Di MIFLê de 6 cure motîfên îmtihanê cih girtine. Di serenavê xebata Thompson de sînorek nehatiye danîn wek ev rêbaz li ser berhemên folklorîk yê kîjan kîjan netewan karîger e an nîne. Ev jî navnetewîbûnekê li ser vê xebatê zêde kiriye. Em jî rabûn me hewl da ku vê rêbazê li ser destanên Kurdî bisepînin û ji van destanan mînakên motîfên îmtihanê tesbît bikin. Di dawiya vê xebatê de em gihîştin van encaman:

1. Her çiqas di Motif Indexê de ji destanên Kurdî mînakên motîfan cih negirtibin jî ev rêbaz li ser destanên Kurdî jî karîger e. Ev navneteweyîbûna vê rêbazê nîşanî me dide.
2. Di destanên Kurdî de ji 6 cure motîfên îmtihanê yê ku di MIFLê de cih girtine motîf hatine tesbît kirin. Ev jî ev in: Îmtihanên nasnameyê, îmtihanên rastiye, îmtihanên zewacê, îmtihanên jîrekiyê, îmtihanên qabîliyetê û îmtihanên dinê. Di vê xebatê de di bin 6 serenavan de bi tevahî 48 cure motîf hatine tesbît kirin. Di nav van motîfan de motîfa herî zêde derketiye pêş me bi 28 mînakên, motîfa

îmtihana qabîliyetê ye. Motîfa herî kêr jî bi mînakek, di nav rêza îmtihanên rastiyê û îmtihanên jîrekiyê de bi ber destê me ketine. Bi tevahî di nav 8 destanên Kurdî de 135 mînakên motîfa îmtihanê hatine tesbît kirin.

3. Ji 23 cure mînakên motîfên ku di Motîf-Indexê de cih girtine tenê motîfa îmtihanê di vê xebatê de cih girtiye. Li ser 22 motîfên mayî pir bi rehetî xebat dikare bêne kirinê.
4. Di destanên Kurdî de hinek mînakên motîfa îmtihanê di MIFLê de cih negirtine. Ev mînak wek pêşniyar dikarin li ser lîsteya MIFLê bêne zêde kirin.

Di dawiya vê xebatê de hatiye dîtin ku di destanên Kurdî de li gor şematîzekirina motîfan ya MIFLê jîmareke pir zêde mînakên motîfên îmtihanê cih girtine. Em di wê baweriyê de ne ku ev xebat wê di lîteratûrê de cihekî girîng dagire û ji bo xebatên dahatûyê wê bibe çavkaniyek li pêş lêkolîneran.

ÇAVKANÎ

- Abalı, N. (2009). Türk Halk Hikayelerinde "İlk Görüşte Aşk" Motifi, Ensest Yasağı ve Egzogami, Milli Folklor, Cild -, Jimar 83, 97-102.
- Akot, B. (2010). (Freud'un Rüya Yorum Metodu, Dinbilimleri Akademik Araştırma Dergisi, Cild 10, Jimar 1, 213-235.
- Aktulum, K. (2013). *Folklor ve Metinlerarasılık*, Konya: Weşanên Çizgi.
- Aktulum, K. (2022). *Folklor Söylemi*, Stenbol: Weşanên Çizgi.
- Alan, R. (2013). *Folklor û Roman*, Stenbol: Weşanên Peywend.
- Alptekin, A. B. (1997). *Halk Hikayelerinin Motif Yapısı*, Enqere: Weşanên Akçağ.
- Alsaç, D. F. (2020). *Masal Kahramanlarının Tip Çözümlemesi*, Stenbol: Weşanên Hiperyayinê.
- Amedî, F. (wer) (2014). *Qur'ana Kerîm û Meala Wê Ya Kurdî*, Enqere: Weşanên Ensar Neşriyatê.
- Aras, A. (2019). *Siyabend û Xecê*, Stenbol: Weşanên Nûbihar.
- Aras, A. (2022). *Kerr û Kulik*, Stenbol: Weşanên Nûbihar.
- Aslan, P. D. (2001). *Halk Hikayelerinde İmtihan Motifi Kompleksi*, Milli Folklor, Cild -, Jimar 51, 5-14.
- Aslan, P. D. (2011). *Masal Araştırmaları Ve Korkak Ali Masalı Üzerinde Bir İnceleme*, Milli Folklor, Cild -, Jimar 52, 33-45.
- Atlı, Z. S. (2018). *Berawirdek Li Ser Çar Varyantên "Siyabend û Xecê"*, <http://kovarabir.com/> (Dîroka Xwegihandinê: 27.12.2020).
- Aytan, O. A. (2021). *Hareketli Avcı-Toplayıcı Grupların Yaşam Biçimiyle Yerleşik Çiftçi Toplulukların Yaşam Biçimi Arasındaki İnsan-Mekan İlişkisinin Mukayesesi*, Kahramanmaraş Sütçü İmam Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi, Cild 2, Jimar 18, 979-1012.
- Balkaya, D. A. (2015). *Halk Anlatılarında Kahramanın Yardımcıları*, Qeyserî: Weşanên Fenomen.
- Boratav, P. N. (2013). *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*, Enqere: Weşanên BilgeSu.
- Burke, P. (1996). *Yeniçağ Başında Avrupa Halk Kültürü*, Enqere: İMGE Kitabevi.
- Celîl, O û C. Celîl. (2021). *Destanên Me*, Diyarbekir: Weşanxaneyê Wardozê.
- Celîl, C. (2021). *Zargotina Kurdên Sûrîyeyê*, Diyarbekir: Weşanên Wardozê.
- Cewerî, F. (2003). *Antolojiya Çîrokên Kurdî (1856-2003)*, Stenbol: Weşanên Nûdem.

- Cizîrî, Ş. (2020). *Edebîyata Devkî û Şer*, Enqere: Weşanên Lîs.
- Çalışkan, F. K. (2018). *Arpaçay Köylerinden Derlenen Masalların Ve Halk Hikâyelerinin Motif İncelemesi, (Teza Mastirê ya Neçapkirî)*, Kırşehir: Ahi Evran Üniversitesi, SBE.
- Çetin, N. (2017). *Roman Çözümleme Yöntemi*, Enqere: Weşanên Akçağ.
- Çobanoğlu, Ö. (2000). *Aşık Tarzı Kültür Geleneği ve Destan Türü*, Stenbol: Weşanên Akçağ.
- Çobanoğlu, P. D. (2019). *Halkbilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş*, Enqere: Weşanên Akçağ.
- Damrosch, D. (2013). *Dünya Edebiyatı Nedir?* Stenbol: Weşanên İstanbul Bilgi Üniversitesi.
- Digital Library: <https://babel.hathitrust.org> (Dîroka Xwegihandinê: 24.12.2022).
- Dilaver, Ö. (2011). *Charles Dickens'ın İki Şehrin Hikayesi ve Reşat Nuri Güntekin'in Damga Romanlarında Fedakarlık, (Teza Mastirê ya Neçapkirî)*, Isparta: Süleyman Demirel Üniversitesi, SBE.
- Dorson, R. M. (2017). *Folklor û Teoriyên Folklorê Yê Îroyîn*, Stenbol: Weşanên Avesta.
- Dumezil, G. (2012). *Mit ve Destan 1- Hint - Avrupa Halklarının Destanlarında Üç İşlev İdeolojisi*, Stenbol: Weşanên Yapı Kredi.
- Dumezil, G. (2018). *Mit ve Destan 3- Roma Tarihleri*, Stenbol: Weşanên Yapı Kredi.
- Dundes, A. (1998). Motif Index ve Masal Tip İndeksi: Bir Değerlendirme, *Milli Folklor*, Cild -, Jimar 39, 130-135.
- Dursun, D. Ö. (2018). *Mit, Destan ve Halk Hikayelerinde Birinci Dereceden Kahramanların Statüleri Üzerine Bir İnceleme, Söylem Filoloji Dergisi*, Cild 3, Jimar 1, 19-38.
- Eliade, M. (1992). *İmgeler ve Simgeler*, Enqere: Weşanên Gece.
- Eliade, M. (2001). *Mitlerin Özellikleri*, Stenbol: Weşanên Om.
- Eliade, M. (2022). *Ebedi Dönüş Miti*, Stenbol: Weşanên Dergah.
- Filiz, M. Ş. (2014). *Xebatek li ser Destana Dewrêşê Evdî, (Teza Mastirê ya Neçapbûyî)*, Mêrdîn: Zanîngeha Mardin Artukluyê, EZZ.
- Frazer, J. G. (2018). *Ateşin Kökenine Dair Mitler*, Enqere: Weşanên Doğu Batı.

- Gernas, A. (2022). *Folklor û Civat (Folklor, wêje, ziman, çand, xeyset, muzîk, urf û adet, dîrok)*, Stenbol: Weşanên Nûbihar.
- Geverî, A. (2011). *Mem û Zîn ve Hüsn ü Aşk Karşılaştırması Bağlamında Klasik Kürt ve Türk Edebiyatı Üzerine Notlar*, Academi.edu: <https://www.academia.edu/891642/> (Dîroka Xwegihandinê: 23.12.2021).
- Güzeler, M. (2021). *Folklorê Qerejdaxê (Pirsên Pêşyan, Biwêj, Qirwelk, Nîfir û Dua)*, Stenbol: Weşanên Nûbihar.
- Hassanpour, A. (2005). *Kürdistan'da Milliyetçilik ve Dil 1918-1985*, Stenbol: Weşanên Avesta.
- Hikmet, B. (2016). *Teorîyên Folklorê*, Diyarbekir: Weşanên Lîs.
- Hikmet, B. (2016). *Teorîyên Folklorê*, Diyarbekir: Weşanên Lîs.
- İnan, A. (1987). *Makaleler Ve İncelemeler-1*, Enqere: Weşanên Türk Tarih Kurumu.
- Jaba, I. (2016). *Camî'eyê Risaleyan û Hikayetan*, Stenbol: Weşanên Avesta.
- Kaplan, Y. (2019). *Beyt û Destanên Kurdî*, Stenbol: Weşanên Nûbihar.
- Karagöz, D. E. (2019). "Motif-Index of Folk-Literature" Kullanımı Ve Karşılaşılan Bazı Sorunlara Çözüm Önerileri, Milli Folklor, Cild -, Jimar 124, 75-90.
- Kardaş, C. (2017) *Aşığın Sazı Dengbêjîn Sesi (Dengbêjlik ve Aşıklık Üzerine Karşılaştırmalı Bir İnceleme)*, Enqere, Weşanên Eğiten Kitap.
- Kaya, S. (2002). *Kur'an'da İmtihan*, (Teza Mastirê Ya Neçapkirî) Sakarya Üniversitesi, SBE.
- Kaya, S. Ü. (2021). *Dünya Edebiyatlarında Rüya Motifi: Karşılaştırmalı Bir Analiz*, ASBİDER Akademi Sosyal Bilimler Dergisi, Cild 8, Jimar 24, 449-458.
- Kefeli, E. (2000). *Karşılaştırmalı Edebiyat İncelemeleri*, Stenbol: Weşanên Kitabevi.
- Keskin, N. (2019). *Folklor û Edebiyata Gelêrî*, Stenbol: Weşanên Avesta.
- Kurmancîyê, K. (2019). *Rêbera Rastnivîsînê*, Stenbol: Weşanên Weqfa Mezopotamyayê.
- Kurtlu, Y û Koçak, B. (2015). *Halk Anlatılarının Epik Kuralları Işığında Bir Destan İncelemesi*, Current Research in Social Sciences, Cild 1, Jimar 1, 1-8.
- Lescot, B. R. (2020). *Memê Alan*, Stenbol: Weşanên Avesta.
- Mukrîyanî, M. (2018). *Folklorê Ronahîyê*, Diyarbekir: Weşanên Wardozê.
- Oğuz, M. Ö. (2004). *Destan Tanımı ve Eski Türk Destanları*, Milli Folklor, Cild -, Jimar 62, 5-7.

- Oğuz M. Ö. (2020). *Türk Halk Edebiyatı*, Enqere: Weşanên Grafiker.
- Ong, W. J. (2014). *Sözlü ve Yazılı Kültür Sözü'nün Teknolojileşmesi*, Stenbol: Weşanên Metis.
- Öcal, M. O. (2013). *Türk Dünyası Halk Biliminde Yöntem Sorunları*, Enqere: Weşanên Akçağ.
- Örkün, B. (2018). *Jack Goody'nin Kavramsal Dünyasında Mit, Destan, Efsane ve Masal*, Motif Akademi Halk Bilimi Dergisi, Cild 11, Jimar 22, 127-140.
- Pelin, Y. (2017). *Halk Anlatılarında Yüzük*, Academia.edu: <https://www.academia.edu/38633518/> (Dîroka Xwegihandinê: 27.12.2021).
- Pertev, R. (2015). *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî*, Stenbol : Weşanên Avesta.
- Propp, V. (1998). *Folklor Teori Ve Tarih*, Stenbol: Weşanên Avesta.
- Propp, V. (2018). *Masalın Biçimbilimi*, Stenbol: Weşanên İş Bankası.
- Ritter, P. D. (2011). *Doğu Mitolojisinin Edebiyata Etkisi*, Stenbol: Weşanên Ayrıntı.
- Sadinî, M. X. (2014). *Feqiyê Teyran*, İstanbul: Weşanxaneyê Nûbihar.
- Sadinî, M. X. (2014). *Mela Huseynê Bateyî*, İstanbul: Weşanxaneyê Nûbihar.
- Sakallı, C. (2014). *Karşılaştırmalı Yazınbilim*, Enqere: Seçkin Yayıncılık.
- Samur, A. (2012). *Destana Zembîlfiroş û Gulxatûnê, (Teza Mastirê ya Neçapbûyî), Zanîngeha Mardin Artukluyê, EZZ.*
- Semend, S. (2019). *Siyabend û Xecê*, Stenbol: Weşanên Hîvda.
- Serhedî, M. (2018). *Folklorê Hawarê*, Diyarbakir: Weşanên Wardozê.
- Thompson, S. ulberta: https://sites.ualberta.ca/~urban/Projects/English/Motif_Index.htm (Dîroka Xwegihandinê: 22.01.2022).
- Uludağ, S. (1991). *Aşk Maddesi*, TDV İslâm Ansiklopedisi, <https://islamansiklopedisi.org.tr/ask#1> (Dîroka Xwegihandinê: 27.12.2020).
- Ülken, H. Z. (2022). *Destanlar*, Enqere: Weşanên Doğu Batı.
- Xanî, E. (2016). *Hemû Berhem*, Enqere, Weşanên Lîs
- Xendekî, R. (2018). *Folklorê Roja Nûyê*, Diyarbakir: Weşanxaneyê Wardozê.
- Yaprak, P. U. (2017). *Halk Anlatılarında Yüzük*, .Academia.edu: <https://www.academia.edu/38633518/> (Dîroka Xwegihandinê: 12.12.2020).
- Yıldırımçakar, Z. û Güzel, Ş. (2021) *Bibliyografyaya Tezên Master û Doktorayê Yên Beşên Ziman û Edebiyata Kurdî û Ziman û Çanda Kurdî (2011-2020)*, Kurdiyat, Cild -, Jimar 3, 67-99.